

KORDA MAD
KARWANÊN
BÊXEWIYÊ
«AXÎNA WELAT»
KORDA MAD KARWANÊN BÊXEWIYÊ

*KORDA MAD*

# KARWANÊN BÊXEWIYÊ

(Helbest û poêm)

WEŞANÊN "AXÎNA WELAT"
Moskova 1998

*Ji bo wan, ên ku ramana netewî vejiyandin,*
*lê mirovahî ji bîr nekirin...*

**K.Mad**

*J-xwe ra çerezke van mitalên min-*
*cîhanek nuhê li ber te vebe...*

K. M.



*Korda MAD*

# *KARWANÊN BÊXEWIYÊ*

*(Helbest û poêm)*

WEŞANÊN "AXÎNA WELAT"
Moskova - 1998

## HEVDÎTINEKE DERENGMAYÎ...

...Te destaneke nû hildaye destê xwe, xwendevanê hêja, destane, ya ku dikaribû deh salan berê derketibûya ronahiyê û, dibe ku, ew êdî yek ji çend dîwanên Korda Mad(Ezîzê Cewo) bûya...

Ev nav jî ji xwendevan ra êdî ji zû va nas e- hem wek helbestvan, hem wek rojnamevan... Xwendevan bêhtir ji berhemên Korda Mad ên rojnamevaniyê ra nas e, lê berevokeke weha ya helbestan cara yekêm e, ku tê destê wî...

...Û dema ku ev dîwan ji bo weşanê amade bû xudanê wê pêşniyar kir, ku ji bo pêşgotinê 2-3 rûpelan cuda bikin lê tiştekî lê nenivîsin, paqij bihêlin, ji bo ku her xwendevanek, piştî xwendina dîwanê nêrîna xwe binivîse.

Hîn berî vê K. Mad di helbestekê da dibêje: **"...Lê ger ew helbest ji raman û hesîn/ Û xewnên te re nebine bersîv.../Destê te negirin /Û di cîhana mine rengîn da /Te nekin mêvan,.../ Wî çaxî tu...van destxetên min /Bavêje nava ewê kûrayê- /Bila di nav da ew bisincirin; /Bi pêlesûyên wê bibine kozî...**- Û ev gotin jî ji jixwe-bawerbûn û hêviya berbi xwendevan tên.

Di vê cîhana poêt a biçûk da tuyê pêrgî ra-manên rengorengo bêyî: welat, mirovahî, fel-sefa jiyanê, dîrok û zarok-wek sembola dîha-tûya mirovahiyê...

**Mirov î, mirov im bira, /Destê xwe bide destê min,/ Peyveke xweş jî ji min ra/ Jiyan û erşekî bê bin!..**

Poêt wek parçekî mirovahiyê raman dike, lê ji bîr jî nake:

**"... Lê ya sere ewe, lawo,**
**Kuda diçî, kî jî hebî,**
**Wexta roja bavo-bavo**
**Netewa xwe tu bernedî...**

Yan:

**Gelek pêlê bên û herin-**
**Qenc û xirab tê bibînî,**
**Pêl in, wê bên - bibihurin,**
**Her j- bîr meke, ka tu kî yî!**

Her tişt di cîhanê de netevatiyê dide K. Madû di wê de ew bingheke felsefî dibîne:
**"Jiyanam xewn e, / Cîhan tev xewn e, Û eva xewna / Min sêwirandiye." -**

Lê her weha jiyan ji bo wî rêalîteke objektîv e:
**"... Her kesekî me di jiyanê da /Yekî ji pêşên xwe, /Yan pêşê pêşan diwekilîne..."**

Û li ser naskirina xweza -jiyan- civakê K. Mad bi poêtîkî aliyên jiyanê û civakê yên girtî vedike û natirse jî, ku rastiya jiyanê ya tel derxe holê:
**" ... Wê hela hê biqewime,/ Ku yên neçê /Dewsa yên çê wê bigirin, /Wê yên nezan Ser zanan da hê biqûjin, /Xevên şemme /Wê heal hê /Dersê bidin mervên aqil,/Û aqilê ji wan "hînbin"..."**

Û ji vê jiyana rêal a giran ra mirov derbasî bûyerên Kurdistanê dibe, dide pey kêşa **"Kerwanê bêxewiyê"**, çil û çiyayên Kurdisatnê ra dibuhure, hovîtiyên dagerkeran dişopîne û tê ser wê baweriyê, ku:
**"... Û ta îro jî, wek wan pêşiyên xwe, /Ew dijminê me dîsa maye ew, /Ger lê pêwîst be, me dighîne xwe, /Lêk hema dem hat, me zol dike ew!"**

Û her bûyerek bersîveke felsefî di vê dîwanê de dibîne, ên ku dibin sedemên ramanên cihêreng- riya xwedîtin û xwenaskirinê vedikin...

Ji ber vê jî, dibek hîç hewcê pêşgotineke weha jî nedikir, lê ev dikare bibe wek destpêkekê ji bo govtuguha li ser mitalên xudanê vê destanê... Ji xwe ewqes jî girîng nîne, ka ew gofgtuguhê bi kê ra pêk bê: bi xudanê vê destanê, bi xwendevanên din, an xwe bi xwe ra?

Emê benda goftuguhên xwendevan bin...

***"Axîna Welat"***

# BERGEHA PÊNÛSÊ



## JI XWENDEVANÊ N MIN RA

*Tu keç î, xort î... Kî yî?- Nizanim!*
*Tu heyî, dijîyî, yanê hela hê*
*Dê û bavê te b'zarkî dilîzin!..*
*Û tuyê hê paşê ji jîn- evîna*
*Wane jîyandar bêyî Cîhanê!?..*
*Tu kî jî hebî û l'ku jî hebî,*
*Kengê jî bêyî... Eger tu evan*
*Xet û rêzên min hildî bixwînî,*
*Û ger bi wana*
*Pêlesûyên agirê vê ramana min*
*Bi xwe agirê dilê te gurkin,*



*Ezê bizanbim, ku pênûsa min*
*Li ser kaxetê badê nezviriye...*
*Lê ger ewana j'raman û hesîn*
*Û xewnên te ra nebine bersîv...*
*Destê te negirin*
*Û di cîhana mine rengîn da*
*Te nekin mêvan,*
*Ji te ra nebin hevalên demê*
*Û tenêtiya te ew danegirin...*
*Wî çaxî bi xwe di nava xwe da*
*Tu kûra agirê dilê xwe gurke*
*Û evan belgên van destxetên min*
*Bavêje nava ewê kûrayê-*
*Bila di nav da ew bisincirin;*
*Bila li wira ew weke êzing*
*Di nav alava ramana te da*
*Bi pêlesûyên wê bibine kozî.*
*Û wê koziyê jî tu bi destê xwe*
*Bide ber devê bayê firtonê!..*

**4'ê avrêlê, 1985., Sîpan**

# KULAMA MIN

*Qe çiqas kulam nav min da hene-*
*Ez bûme dengbêj îro û hertim,*
*Min tirê min va per û bask hene-*
*Berbi erşê şîn ez wê difirim!..*

*...Ez wê difirim û têm berbi te-*
*Nizanim kuda, kîalî da bêm?-*
*Ey, tu xiyala mine bêfeyde,*
*Dîsa bêsebir ez berbi te têm!*

*Hed û sînorên te ez baş zanim,*
*Lê ax û av te min nedîtiye-*
*Baweriya min î, bi te bîn didim,*
*Zef jî dîl ketî- îja çi feyde?..*



*Yek e, dilê min j'bona te distrê,*
*Yek e, çavên min j'bona te digrîn,*
*Ji roja bûyna xwe da, min tirê,*
*Min derdê te diye- bi kul û birîn...*

*Dîsa bask didim û berbi te têm-*
*Mîna qulingê j'refa xalifî:*
*Ezê perwazdim, bifirim û bêm,*
*Dayîk, tê şabî li min ewledî!..*

*Tê dest nav porê min bibî- bînî-*
*Wek dayka dîbe zara xwe winda,*
*Tê li min şabî,- şabûna bigrîyî,*
*Û wê hêsa be dilkê te wisa!*

*Û ezê pey ra dîsa bistirêm-*
*Hizkî j'te dûr bim, yanê jî- bal tê,*
*Kuda jî herim, ezê dîsa bêm,*
*Bêm û bistirêm her azadiya te.*

*...Lê-k bextêm neyne- ez te nebînim,*
*Ji dinê herim- bê nêt û feyde-*
*Pey min ra bila ev rêz bimînin-*
*Azadiya te ra ruhêm perwazde!...*

**Gelavêj, 1985 , Sîpan**

## EZ- NIVŞDANG

*Wek destanekê ez li ber we me:*
*Carna hiltînim- xwe dinivîsim,*
*Pelên xwe digrim, wêda datînim,*
*Rûpelê xweyî dinê vedikim-*
*Nuh despê dikim-*
*Bi xwe carek din xwe dinivîsim...*
*Û dîsa dem tê,*
*Çaxeçerx dîsa fitlekê dide,*
*Ez rûpelekî nuh dinivîsim...*
*Dîsa hiltînim- ez xwe qatdikim-*
*Wêda datînim...*



.........................................
*Îro jî dîsa min xwe nivîsiye,*
*Sibê jî ezê xwe binivîsim,*
*Ezê binivîsim û wêda daynim...*
*Û paşê hûnê hildin qat bi qat*
*Yekbelg min perkin...*
*Û ezê weke destane- nivşdang*
*Hemû hebûna vê heyîka xwe*
*Merd û merdane li ber we vekim...*
*Hinekê j'xwe ra bi heyr û hewas*
*Beyt û çarînên min biçilpînin,*
*Lê hinek dibe hildin- bixwînin...*
*Û wê destanê carek din perkin:*
*Ewê carek din li min vegerin,*
*Ewê carek din min vekolînin...*
*Û, dibek- metel dor xwe binhêrin...*
*Wisa jî dibe!..*
*Wisa jî dibe!..*

**Kewçer, 1987., Moskova**

## EZ Û MÛZA[1]

*Bi mûza xwe ra çendik- çend salan*
*Min çûyîn- hatin qet girê neda,*
*Rabûm- rûniştim ez weke caran*
*Û zanînê va mijûl bûm guva.*

*Lê, wexta salên min bihurîne,*
*Mûza carek din min bûye tirik,*
*Kuda jî diçim, min ra digihîne-*
*Min venagere bi "gef" û "girik"...*

*Piştî "azadiya" ewqas wede ra*
*Ewê carek din ez "dîl" kirime,*
*Li min "bend kirye" dest- pê û sewda-*



*Berbi Parnasê[2] poêtan dibe.*


*Rojêm bi fesil tên- dibihurin,*
*Mûza li her ciya min diqeside,*
*Hesîn û sewdêm tevhevdu dibin,*
*Xweşgalegala pênûsam dide...*

*-Tu bi xêr bêyî, ey, mûzaya min,*
*Hatna te timê dilêm şa dike,*
*Bi hatina te bi per- bask dibim-*
*Cîhan d'çav min da xweş beşer dide!..*

**Rêbendan, 1984., Sîpan**



BENGA WELÊT



# JI KURDISTANÊ RA

*Mîna poêtên rojên dewrwinda*
*Di nava xezna gotinên min da*
*Ne ew parêziyên ji dêran hiltên,*
*Ne jî xêr- duên ebba[3] û keşîşan,*
*Ne nimêj- stranên şêxa û mellan,*
*Yan ew koçekiyê mirtiv û boşa[4]*
*(Yên bi kefa dêst bexta peşk dikin!),*
*Ne jî dirozgên "Dewrêşên dinê"*
*Tê qet nebînî... ne jî wê hebin...*
*Û ez digerim, peyvan çar nakim,*
*Ne jî b'cûrê wan dixwazim îro*



*Hîvî-lavayan berb esmîn rêzkim,*
*Dua- dirozga wir da verêkim,*
*Welatê minî kal-bavayî kevnar,*
*Ez daxwaza xwe j'bo te diyarkim...*
*Ne jî d'nav min da "Oleke meşûr",*
*Ku êzdî ola xwe hesab dikin,*
*Dikare naha bi dirozgên xwe dilêm hêsake...*
*Çimkê îro ez- Peyhatiyê Madî-*
*Çax û deman ra heylo j'Navçemkê[5]*
*Pey sal dewran ra gihîştime vir...*
*Û j'per- baskên xwe min êdî îro*
*Yekser dawşandiye ol û parêzî,*
*Û xût vê demê di nav eyîtî û ruhê min da*
*Bawerîk maye- baweriya mirov û Welatê min!*
*...Tu olê ezê qet neparêzim xêncî Azadiyê,*
*Eger ol bi xwe nebe aleke azadiya mirov,*
*Ji ber ku mirov tenê b'azadiyê herdem mirov bûye;*
*Ger ne azad be, ew çi mirov e, û kêrî çi tê?!*
*...Lema jî mirov hê di dema çêbûna xwe da*
*Ji bo azadiyê ewqas b'gef û gur dew û doz daniye...*
*...Dîsa ola min û baweriya min her azadî ye:*
*Gel û welatêm ji bo azadiyê herdêm bîn didin,*
*Û ev azadî ji bo min herdem bihurtî bûye...*
*Lema jî ji vî welatê hanî nêzîk, hem jî dûr*
*Li rû cîhanê, ey, tu welatê xweşmerd û zana,*

*Dîsa ji bo te Azadiya here mezin dixwazim!*
*Û, ji bo rojekê ez bikaribim Azadiyê bînim,*
*Ey, tu wlatê zane- nebîyên Rojhilata kevn,*
*Evî meskenî, ku min çavê xwe têda vekirye,*
*Bihêlim û bêm, berpêyî tebim-*
*Wek j'bo Azadiya Hêllada[6] bihuşt*
*Bayronê mezin serê xwe danî-*
*Serê xwe daynim nav ax- berên te,*
*Ku rêa kal û bavê min lê ye,*
*Û b'xwîn qinêta wan heya îro*
*Defa sîngê min hiltê û datê...*
*Û, wexta dewr bên- jev bibihurin,*
*Û çaxê sal bên j'sala derbas bin,*
*Welatê Xanî, Feqî û Cizîrî,*
*Meskenê Hejar, Gyûnêy û Cegerxwîn,*
*Ez dîsa hercar, her bahar-havîn-*
*Pey berf- belekiya û baranan ra*
*Pey gul û gupik, sosin, beybûnan,*
*Pey her hêşnahî, zîleke ter ra*
*Çavê xwe vekim û te binihêrim-*
*Ez te bibînim, Welat, serbest î,*
*Bizanbe, ezê li rû cîhanê*
*Miriyê ji zêndiyan bextewartir bim...*

**Reşemî, 1984., Yêrêvan- Sîpan**



## XWEZÎ

*Kurdistanek aza hebûya-*
*Hizkî ji min dûr,*
*Kurdeke naz min re hebûya-*
*Tev biçûma wir!*

*...Biçûna wir em tevayî-*
*Bi riya kese- kin...*
*Biqûriyama:"Tu aza yî,*
*Ey dayka min!..*

*Tu aza yî, dayîka me,*
*Emê va hatin...*
*Em in, binhêr, berxikên te,*

*Bo te xelat in!..."*

*Dayîkê jî- serbest- aza-*
*Xweya text û tac,*
*Ewled li xwe berevkira-*
*Bê qelen û bac!...*

*Kurdistanek aza hebûya-*
*Bila ji min dûr,*
*Kurdek bavçê xwe ra hilda-*
*Ez biçima wir!...*

**23.01. 1990. Yêrêvan**





# SOND

*Tu- sonda li ser zarê me tevan,*
*Tu- birîndara kul û kederan,*
*Tu- xem û xiyal, xewna nav rojê,*
*Tu- girî û ken- dîla dest dojê...*

*Tu- hizinga me, ax- keser û derd,*
*Dijmin pêpes kir nav- nîşan û erd,*
*Xwîna me rijya wek çem û derya-*
*Mirov em dîtin- ji me dagerya;*

*Ewê dagere û wê deng neke,*
*Eger kurd bi xwe çarê l'xwe neke:*
*Cîhan wisa ye- ger em bêdû bin,*
*Herçên dora me wê ji me dûr bin...*

*Azadiya xwe her em bi xwe karin*
*Bi jîn û xwîna xwe bigihînin:*
*Bo Kurdistana xwe dîl û bindest*
*Xwîna xwe bidin- ew bibe serbest....*

*Tu- sonda li ser zarê me tevan,*
*Tu- birîndara kul û xezevan,*
*Tuye xewna me- roj nava rojê...*
*Emê rizgar kin te j'agrê dojê!..*

**14'ê rezberê, 1991., Yêrêvan**





## SERHILDAN
**(Benga Şoreşê)**

*Serî hildaye gelê minî kurd-*
*Hatiye- hingavtiye çiya û gelî- geboz,*
*Îro ew rabûye xweşmêre û xurt-*
*Bo Kurdistanê daniye dew û doz.*

*Rabin, birano, xweşmêre rabin,*
*Pêra gihîştiye roja doza me,*
*Ala xwe rengîn em hilbirînin-*
*Dijmin derînin ji Welatê xwe!*

*Kurdê ha rabe- heya ew hebe:*
*Erş- erda ewê tevde bo Welêt,*
*Wê jiyana xwe tu nehêvşîne-*
*Û raqetîne wan hovên kirêt.*

*Rabin, birano, mêrane rabin,*

*Pêra gihîştiye êdî rôja me,*
*Emê zoraya xwe bicivînin-*
*Dijmin derînin ji Welatê xwe!*

*Bîna azadiyê em kirine yek-*
*Em tev rabûne û naên raê:*
*Bo Kurdistanê me hildaye çek,*
*Emê li dijmin rakin fermanê.*

*Rabin, em rabin, tev bi yek rabin,*
*Êdî va, hatiye roja doza me,*
*Heş- sewda û raê xwe bicivînin-*
*Zevtkar derînin ji Welatê xwe!*

*Êdî rabûne- em xweş rabûne-*
*Ala xwe rengîn me hildaye jor,*
*Xûşkên me delal- ew jî rabûne-*
*Hildane ala me kesk, zer û sor...*

*Rabin, birano, xweşmêre rabin,*
*De hûn jî rabin dê û xûşkên mê:*
*Hêz û zoraya me bicivînin-*
*Dijmin derînin ji Welatê me!*

**Berfanbar, 1991., Yêrêvan**



# DE RABE, EY KURD!..

**(Beyta kurdê ji welêt dûr)**

**Ya me çi, lawo?!-**
**Em xweymal û -halin...**
**Ez, ku kurdên me -**
**Wa cîşihitî,**
**Li serê rê- dirban,**
**Li xerîbiyê- bê mal**
**Û sergedan dibînim,**
**Agir bi dilê min dikeve,**
**Û ez nifirya çarenûsa gelê me**
**Û sebebkarên wê dikim...**
**(Ji gotinên diya min)**


*...Tu j'min dipirsî:*
*-Doza Welêt çiye?*
*-Ew ew e, dema her yek dixwaze*
*Mala wî hebe-*

*Mal, ku ya wî ye-*
*Mala wî bi xwe...*
*Li ku karibe mêvanan xweyke,*
*Cînarên xwe ra qencîkê bike,*
*Şabe, ...bigirî û bixebite...*
*....Heya karibe azad dîn bibe*
*(Mala wî nîne?- Ew û mala xwe-*
*Çi ku bixwaze, wê wê jî bike?!..)*
*Û d'van tevan de ew bi xwe xweyî be-*
*Xweyê mala xwe,*
*Yê xebata xwe,*
*Yê şabûna xwe ...*
*Yê dînbûna xwe...*
*Xweyê xwe bi xwe!..*
*Malên xal- apan çiqas jî baş bin,*
*Xal û ap çiqas jî dilovan bin,*
*Yek e, eger tu sêwî yî, bira,*
*Tu û zarên wan tucar nabin yek-*
*Yek e, ew malan malên apa ne,*
*Yek e, ew malan malên xalan e...*
*Yên pismama ne, malê zêya ne,*
*Ne ku- mala te!...*
*De, îcar were, pey ewqasî ra*
*Hertim mêvan be, hertim sêwî be,*
*Ber destê xelkê parî nan bixwe...*
*Stuyê xarke- li serê riyan be!..*
*(Hizkî padşah bî d'mala xelkê da,*



*Yek e, tê d'wir da timê bêmal bî!..)*
*De were, ey kurd,*
*D'vê cîhanê da,*
*Kurdistana xwe bê ser û bin da*
*Bê mal û hal be,*
*Bê cîh- sitar be...*
*...De rabe, ey kurd!..*

**15. tîrmeh, 1985. Sîpan**



## *XEWN*

*...Çiqas xewneke giran bû, Xwedê,-*
*Ev û ew cîhan tev hevdû bibûn,-*
*Bi çîk û kenc bû ew xewna, Xwedê,*
*Bi tep û tengî û bi hêbet bû...*
*Xewn bû... yan hişyar?..*
*Çavê min hê nuh pêgîhandibûn*
*Herin ser hevdû:*
*Ez xilmaş bibûm-*
*Xew bû, yanê- xewn...*
*Yan ez hişyar bûm?..*
*Ez baş ruh naynim!*
*...Girmîna defê,*
*Qûrîna zurnê...*



*Heralî hêle û hingirme bû:*
*Keç û xortên kurd*
*Wir çît girtibûn-*
*Gerek merdane navê hiştibûn...*
*Û jineke bi kofî- kitanên*
*Meye kurmanciyê kaw wergirtî bû,*
*Lê bêpergal bû...*
*Bisk û keziyên wê li ser çavan da-*
*Wa hatibûn xar,*
*Bin dengê ewê def û zurnê da*
*Çepil hilda bû û direqisî...*
*(Nizanim, xewn bû,*
*Yan ez hişyar bûm?!)*
*Qeyde, tuê bêjî, yê kurmancî bû,*
*Lê dîlana wê?!-*
*Ya Xwedê, çi bû?-*
*Her we bidîta,*
*Weê bigota:*
*-Esseh dîn bûye,*
*Tepa dikeve!..*
*Ça-a direqisî,*
*Toz û xubara ewan der- doran*
*Pê der- dawên xwe*
*Ça l'xwe wer dikir...*
*Û zerp dikeniya-*
*He- he, he- he- he!-*
*Liqîniya wê bû...*

*D'hewê da ewê*
*Çeplê xwe çawa nazik tew dida!*
*(Ya Xwedê, çito bedewiya nedî!)*
*Dîsa dikeniya...*
*Tev metelmayî dorê civya bûn*
*Û lê dinihêrîn...*
*Ez jî pêşda çûm*
*Û serê xwe nav milên wana ra*
*Berbi hindur kir û lê nihêrî...*
*Texmîn kir-*
*Dîtim!*
*-Ey,- go,- lawê min,*
*Çima tu wisa şaş- metel mayî?..*
*Ez im, dayka we-*
*Kurdistana te...*
*Ji kul û derdan êdî dîn bûme!...*
*Çavêm d'xewê da,*
*Ez wa vekişyam...-*
*Ewê carek din çerx da govendê,*
*Govenda meye kaw- naz nihêrî,*
*Berbi min mêl bû:*
*-Na, tifalê min,*
*Ji min metirse,*
*Pêşda were, ha,*
*Hê dîn nebûme...*
*Lê bêyî wê nabe!-*
*Wê terka dîlan- govenda xwe da,*



*Ber min kundveda,*
*Bi tilî- pêçiyên xweye mûmanî*
*Porê min tevda...*
*-Ax, lawên mine hêsire sêwî,*
*Hûn metel mane?..*
*Vê jiyanê de,*
*Ji bo bigihîje azadariya xwe,*
*Pêwîst e, mirov hinekî dîn be!..*
*Ax, çi teyaxî li dilê we ye,*
*Her yekî j'xwe ra serî hildaye,*
*Ketiye qulçekî- hîviya demê ye?!*
*Û dem tên- diçin, lê hûn hîviyêne!*
*Hûn hê hîviyêne, lê dem tên- diçin!..*
*Û evên nemerd*
*Erd û axa we çartîş kirine:*
*Dişewitînin, lê hûn hîviyêne,*
*We darda dikin, lê hûn hîviyêne,*
*We dizêrînin, lê hûn hîviyêne...*
*..Û hûn hîviyêne!*
*Lê dijminê me -*
*Devxwîn hov û har,*
*Dema pêwîst be,*
*Hemû dibin yek,*
*Dema pêwîst be,*
*Me l'ser tîşekî*
*Yek dizêrîne,*
*Hela ne bese,*

*Pê firokên xwe dajo tîşê din-*
*Alî zorkarê wî tîşî dike:*
*Jehra hunartî l'wir direşîne,*
*L'wir direşîne jehra hunertî-*
*Biçûk- mezin va me dişewtîne,*
*Gund û bajaran tarm û tax dike...*
*Lê hûn hîviyêne,*
*Lê em hîviyêne-*
*Hîviya dema xwe.-*
*Ewê destê xwe berbi esmîn kir,*
*Demekê zur bû li wir mêzekir*
*Û paşê zûkiya:*
*-...Ya Xwedê, gelo Xwedê te heye?!..*
*Ji ewî dengî ez bûme russas,*
*Heya kevir jî pêda bûn hesîn,*
*D'cî da lerizîn...*
*...J'cî vecêniqîm, çavê xwe vekir,*
*Dît- ez li mal im,*
*Lê ramana min- di xewna min da*
*Hê perwaz dida- ez dibirim wir...*
*Û d'guhê min da dengê Dayka me-*
*Zîz û zelûlî wa diwekiland:*
*"Û heya kengê,*
*Û heya kengê?!.."*

**Gelawêj- Rezber, 1987., Yêrêvan- Baykonûr**[7]



# TEMÎ

*... Dema bimirim,*
*Hûn çardara min bînin Sîpanê*[8]
*Cikî bilindcî- berbiçav daynin:*
*Bila kes- kinêz, heval- hogrên min*
*Bên û dora min çît bigrîn- rûnîn...*
*Bila bistirên,*
*Lê bila tucar ew nenivêjin,*
*Bila bistirên,*
*Lê tucar bila nelûvînin ew*
*Û şîna şewat li ser min nekin ...*
*Bila sazbend bên- lawkên meye çê,*
*Sazê xwe bila ew baş saz bikin...*
*Û bila lêxin-*
*Û serawekî kurdî- mêranî ew bînin bila...*

*Bila dengbêjên meye kurmanciyê*
*Bên û ser min da*
*Beyt û stranên meye mêraniyê mêranî bêjin...*
*Bila tu kesek ser min da negrî,*
*Hêsir ji çavên tu kesî bila*
*Neşirikin jêr...*
*Bila koma min rabe û here*
*Hespê wî Mîrzê mêrxas û bavçê*
*(Lawê pêşiyê min peyhatiyê Meder)*
*Bibîne- bîne,*
*Yê ku wî çaxî- sed salî pêş da*
*Syarê xweyî leheng li deşta şerê*
*Ber Ezurmê hişt-*
*Hêsir d'çavan da,*
*Heylo ji wira hat derkete vir...*
*Bila ew bînin*
*Ewî kihêlê xweybext û amin*
*Û kotela min li wî girêdin...*
*Bila, ça heq e, pey ra min heq kin...*
*Lê paşê bila ji hersê kuiran-*
*Ew lawê minî ciwan û xişîm,*
*Ê ku bavçê ye- peyhatiyê Meder,*
*Wî hespî siyar be,*
*Û hema bila ji mezelê min*
*Bajo û here Kurdistana min-*
*Tevî nav refên pêşmergan bibe...*
*...Lê, ger qewimî,*



*Ew hespa dîsa- hêsir çavan da*
*Li we vegerya,*
*Dîsa tu cara bêhêvî nebin,*
*Bila yekî din lê syar be- here...*
*Û wê demê bê:*
*Ew hespê êdî we venegere-*
*Hêsir d'çavan da...*

**Gulan- hezîran, 1985. Yêrêvan- Sîpan**



## AWAZÊN PAMPÊ

*(Dîmenên gund)*

*Sibeke xweş li gund vebûye,*
*Wîte- wîta teyr û tûyan e,*
*Dengekî xweş tesele bûye-*
*Kakekaka şivanan e.*

*Ji Dibûrî[10] heya Şaxa[10]*
*Kerê Ûsê wê çît girtiye,*
*Ewê nîvro bajo Kaxa[10] -*
*Pêz d'kêrî da korî girtiye.*

*Wê "şirîtên" pêz û berxan*
*Berjêr şirdan girtin jorda,*
*Bûne xemla Şax û Kaxa-*
*Mîna rext û rişmên kurdan...*

*Hirço kerê pêz lê baxist,*



*Xalê Ûsê wê fîtandê,*
*Bizna kever firqaske xwest,*
*Seê gurêx semtê nadê...*

*Kerê berxa ji gund derket,*
*Jêlva berbi Çevkaniyan[10] çû,*
*Kalînek zîz li nav wan ket-*
*Pezê zayî xweş pêva çû.*

*J'nav kalîna kerê pêz ra*
*Dîsa dengê Hirço xweş tê-*
*Tiştîra nes wêda banzda,*
*Hirço dîsa semtê nadê.*

*Xortan golik j'Kevrê Koro[10]*
*Birin l'Qolçik[9] "hasê kirin",*
*Kêlendkêşan l'Mêrga Feyo[10]*
*Berbi cewê hon xweş kirin.*

*Lê tirmixçiyan bi dengê zîz*
*Stran û berbi kaniyê çûn:*
*Wê distirên hem xort, hem qîz,*
*Li vir awaz hat guhartin:*

*"Kurdistana min bihuşt e",-*
*Dengê Leylê fûr dide- tê,-*
*"Gelê wê jî pir hurmet e",-*

*Seda Meder xweş pêra tê...*

*Paşê ro hey yan mêl dibe,*
*Hêdî berbi ava diçe-*
*Sî j'Dibûrî dadkeve- tê-*
*Tarî erdê hildiçine.*

*Û şinge-şinga zengilan,*
*Dengê berxa, kalîna pêz*
*B'êvarê ra tên ji mêrgan-*
*Gund vekirye ber û hemêz.*

*Tên.. û gund li hev diçe- tê,*
*Dibe hêle û hingirme,*
*Gundî berbi bêderê tên-*
*Çavnihêriya berxê xwene...*


*Tarî erdê hildiçine,*
*Ronahiyên gund vêdikevin...*
*-Berxên zêde l'bal kê hene?!-*
*Berxvan bi zîz gazî dikin...*

*Û b'van dengên hane zîz ra*
*Êvar hêdî ji gund diçe,*
*Tariya şevê j'best- beyaran*
*Tê û gundê me vedipêçe...*



*Paşê lempên gund bi rêzê*
*Pey hev yek- yek ditemirin...*
*Yek wê zerzê davê dêrî-*
*Dengên şevê vedimalin...*

**Gulan, 1980. Karçaxpyûr**[11]



# HESÎN Û BÎRÎ



# *KULAMA BAHARÊ*

*Berbangda bariye baraneke hûr,*
*Hey pêra gur bûye û hey vekiriye,*
*Û keskesorê kevan daye dûr-*
*Nedîra tavê dinê beşirye...*

*Keskesorê ra tu j'mal derketî-*
*Ter û terlanî- xemla teye tam-*
*Hevreng li serê xwe girêdayî-*
*Wê berbi min tê baharek temam.*

*Va bahar hatiye- şabûn û şadî,*
*Û tev dikenin tu û tavê va,*
*Temeziya serê teye hevtrengî*
*Qey şirdan girtiye keskesorê va!*

*Tav û keskesor, yan tu yî bedew,*
*Kî we ye şaya dilê min îro?..*
*-Yek we bêy yekê?- Na, na, qe dibe?!*
*Hûn evîna min ez j'we ra gîro!*

**Gulan, 1985. Yêrêvan**



# BEYTA YÊ EVÎNDAR

*Ew xet û xal, birû- bijang-*
*Qey b'qelemê kişandî ne,*
*Qaşê çavên teye delal-*
*Qey j'okyanê hiçinî ne...*

*Lê meşa te, ew meşa te...*
*Ez meşa te, ku bîr tînim,*
*Heş û sewda ji min diçin-*
*Dilê xewnên xwe dimînim!..*

**Gelawêj, 1976., Anapa**

## BESEKE MIN HEBÛ...

*Heylê, Besê, Besa minê,*
*Tu kinêz û kesa minê,*
*Ey, tu sewda, hesa minê,*
*Bîna ber qefesa minê...*
*Dîsa îro- j'min ra bîrî,*
*Wisa bêhes çûyî, çima?...*

**Gulan, 1975., Krasnodar**



## ZERÎ

*Mij ji Pampa[9] min vekişya-*
*Aliyê Piçêxa[10] da diçe,*
*Koma zeriya ji gund meşiya-*
*Berbi Kaniya Beko[10] diçe.*

*Zeriya min jî ji mal derket,*
*Fesal li dor xwe nihêrî,*
*Wexta j'dûrva çav li min ket,*
*Wêda rênga xwe guhêrî...*

*Pişt mala ra ew hilkişya-*
*Xwe li riya Kaniya Beko girt,*
*Hûrik-hûrik wêda meşiya-*
*Dilkê min de agir vêxist...*

*-Ezê bême ser riya kaniyê,*
*Rûnim, hîviya te bimînim,*
*Bi ava te aniye, zeriyê,*
*Ewî agirî vêsînim...*

**Gulan, 1983., Sîpan**

## HESÎN Û BÎRÎ

*Ev kambaxê mijê hanê,*
*Çaxê dertê ji Gêdûkê[11],*
*Ji wîalî bîn û buxza*
*Wan kulîlkan j'xwe ra tîne...*
*Êk min û te diçirpandin*
*Bi tevayî...*
*Û ez bengî,*
*Ji wî mijî ezî serxweş*
*Û sewdaser*
*Bê hemdî xwe*
*Rênga ji gund dertê, digrim-*
*Berb wî alî-*
*Ez berbi te "dilingirim"...*

**Pûşper, 1982., Sîpan**



## BÎRÎ

*...Û, dema dîsa tenê rûdinîm,*
*Dikevim nava kûra mitala-*
*Dîsa tu têyî- hêdî û fesal,*
*Kûra dilê min tev hevdu dikî...*

**Berfanbar, 1979., Karçaxbyûr**

## EVÎNNAME

*Û rojekê jî tuyê bêyî gundê me,*
*Wê bibêjin te, ku ne li wir im,*
*Bi pirs- pirsiyara tuyê pê bihesî-*
*Vegeriyame gund heta- hetayê.*

*Essehî nîne- bêyî sêtiya min:*
*Rex "mala" min ra tu here kaniyê-*
*Ew Kaniya Beko*[10] *- ciyê bîriyên berê,*
*Wê hatina te bigihîne min.*

*Lê, eger dilê te ra bibhure,*
*Silavê bidî çavê bin axê,*



*Tu wê silavê bide gul- gîha,*
*Tev min nas dikin, wê bighînin min.*

*Lê, ger wana ez ji bîr kiribim*
*(Cihan e, qe çi dikare bibe?!),*
*Bêje teyr û tûyan: ji wîtîna wan*
*Ezê bizanbim- tu l'van dera yî...*

**Berfanbar, 1986, Yêrêvan**



# BENGA BAHARÊ

**(Nameyek jî)**

*Naha dîsa weke hersal*
*Dor gundê me - çiyayên me kaw*
*Vekirine mil û berpal,*
*Hildane jor deling û daw.*

*Naha dîsa li rex gund ra*
*Çemê zirav- wek tîremer,*
*Dişûlike nav Ada ra-*
*Dorê bihuşt- misk û ember...*

*...Naha, dibek doteke naz*
*Li wir gula diçirpîne,*
*Dibek xortekî bermiraz*
*Çapik berb wê dilezîne.*



*Dibek ewan jî mîna me*
*Li wir dibin dîlê hubê...*
*Hê nizanin ewan, dibek,*
*Kiyê bên wir bahara tê.*

*...Kî jî naha l'wir şa dibin,*
*Bila şabin vê baharê...*
*Bengiyên nuh jî bila şabin-*
*Bahara tê, baharên tên!*

*Bila hersal mîna hersal*
*Dor gundê me- çiyayên me kaw*
*Tîmê vekin mil û berpal*
*Ji bo xort û zerîyên kaw!..*

**Gulan, 1989., Yêrêvan**



# *KURDAM, LI KU YÎ?*

*Bûyî xubara mezîlên erşan,*
*Ji stêrkekê difirî yek din-*
*Û te digerim, ez te digerim...*
*Di vî bajarê meyî xerîb da*
*Ez xalifîme û te navînim...*
*Ez te navînim û te digerim,*
*Ez te digerim û te navînim...*
*Kurda min, bêje, çawa te naskim,*
*Ça te bibînim?-*
*Kanên kezîyên te,*
*Kanên biskên te?*
*Kanên rext- rişme û kofî- kitan?..*
*Tev çûn, betilîn!-*
*Tu îro mayî-*



*Minanî tevan, tevî tevayan...*
*Derya merîyan de wê tu "pêl" didî,*
*Di nav pêlan ra ez wê mil dikim*
*Û te digerim...*
*Ez te digerim,*
*Kurdam, li ku yî?!*

**26. 07. 1990., Yêrêvan**



## GÊJGERÎNG

*Ez hercar dibêm, ez dibêm, dibêm-*
*Êdî ez naêm, naêm berbi te,-*
*Lê dîsa hercar, hercar bê hemdîm*
*Nigêm min tînin li ber derê te...*

*Û, ezî li te heyr û hijmekar-*
*Bêsebir berbi te dilezînim;*
*Û ez têm, ez têm- bengî- sewdaser,*
*Li ber te hêsaîr û destda dibim.*



*Nizam çi bikim, çawa bikim, çaa?..*
*Serê xwe hildim, kîalî herim?!*
*Bêyî te pûç e eva cîhana-*
*Erş- esman xalî- kuda winda bim!?*


*Û ezî melûl, hêsîr, sergedan-*
*Bêy te xalifî dor xwe dinhêwrim,*
*Kuda jî diçim- tenê, bêguman,*
*Mina qulingê bêbask hêsîr im!*

*Û diçim, diçim, ez ji te diçim,*
*Nêtim- bihêlim, dûrkevim ji te,*
*Lê, gava hema çav te dikevim,*
*Gavêm bê hemdîm dilezin berb te...*

*Hercar ez dibêm, ez dibê, dibêm-*
*Tucar ez naêm, naêm berbi te,*
*Lê, wexta hema têyî bîra min,*
*Nêta min paşda difire bal te.*

**Rezber, 1985. li ser riya Yêrêvan-**
**Hoktêmbêryanê**

# PERGALA MIROV



*

* *

*Mirov î, mirov im, bira,*
*Destê xwe bide destê min,*
*Peyveke xweş jî j'min ra-*
*Jîyan û erşekî bê bin!..*

**14'ê avrêlê, 1985, Yêrêvan**



## ŞÎRETÊN DÊYA MIN

*Gelek pêlê bên û herin,*
*Û tê pê ra negihînî,*
*Tê bikevî, wê li texin,*
*Lê tu cara hêsîr nebî.*

*Emir e, lawo - çerx û felek,*
*Tu dikarî bilind bibî,*
*Lê heval û hogirên xwe*
*Tucar- tucar tu j'bîr nekî.*

*Ger dixwazî tenê nînbî,*
*Her nebê- ez, her nebê- ez!-*
*Cîhanê da kî jî hebî,*
*Xwexwe j'bo xwe tu neke bes.*

*Cîhan heye- nerdewan e,*
*Hinek hiltên, hinek datên,*
*Di jiyanê da tenê rast be-*
*Meriyê bi xwe berbi te bên...*

*Lê ya sere ew e, lawo,*
*Kuda diçî, kî jî hebî,*
*Wexta roja bavo-bavo*
*Netewa xwe tu bernedî...*

*Cîhan e, ger biqewime-*
*Di jiyanê da bixalifî...*
*Gotinên dayka xwe bîr bîne,*
*Tê riya xweye rast bibînî.*

*Lê'k qewimî, bo kara xwe*
*Gel û welatê xwe berdî,*
*Hê baş dibe, min j'bîr bike-*
*Û, bizanbe, tê rasrt nebî!..*

*Gelek pêlê bên û herin-*
*Qenc û xirab tê bibînî,*
*Pêl in, wê bên- bibuhirin,*
*Her j'bîr meke, ka tu kî yî!*

**Tirmeh, 1985, Sipan**



# BÊ SERNIVÎSAR

*Carna, min tirê, ezî rezvan bûme-*
*Her tiştî zanim derbarê rez da-*
*...Zanim- sêv, hurmiyan ça bêcer dikin,*
*Hêjîran çawa divê berevkin...*

*Zanim- ka tiriya her bahar- paîz*
*Çawa vedikin û dinixêmin...*
*Ez her- her tiştî, tuyê bêjî, zanim...*
*Hema xût roja bûyîna xwe da*
*Heyanî îro-*
*Her gav û seet:*
*Xew û xewna da, yanê jî hişyar*
*Roj û dewranên çûyî- bihurî*
*Têne bîra min...*

*Û d'wan rojan da- hên û dewran da,*
*Tuyê bêjî, ezî avakar bûme...*
*Tuyê bêjî, bircên Madîye belek,*
*Ku ta îro jî çap û pîvana*
*Kawiya hunerê sewda û destê*
*Mirov tên hesêb,*
*Min çêkirine...*

*Tuyê bêjî, sera, ew hemam û hewz...*
*Û xwendegehên Bitlîsêye kaw*
*Min çêkirine...*
*Tuyê bêjî herhevt ecêbiyên evê*
*Cîhana meye ewqas kevn û nuh*
*Bi evan destan hatine sêwrandin...*
*Kela Dimdimê- çivî bi zinar*
*Hatye rêzkirin!..*

*Carna d'nav min da dengek dibêje,*
*Wekî wextekê zane- nebîyên Rojhilata kevn,*
*Ku cîhan hê jî l'ber wan tiya dibe,*
*Hatine- tev min*
*Ber sivra kurdî çarmêrkî dane,*
*Pala xwe dane balgiyên me qutnî,*
*Kas hilbirîne, sowbet kirine...*

*Wextekê, qey bêy, min şerav û mêy*



*Îkramî Feqî û Xanî kirye...*
*Û j'Cizîrî ra kew- kewê sibê*
*Kaxet û pênûs birne Cizîrê...*
*...Rex sekinîme, bala xwe dayê-*
*Ka Merd- Poêtê hayî erhede*
*Ça wisa şîrin beytan rêz dike...*

*...Û min jî l'rex wî- bi qilçê çavan*
*Xet bi xet beytên û veçinîne...*

*Carna jî m-tirê, tevî Lêrmontov,*
*Pûşkînê mezin*
*Kasa poêtiyê bi pûnşê[12] tuje,*
*Min bilind kirye...*
*Tevî Bayronê bengiyê azadiyê-*
*Li Hêlladyê,*
*Bi mêr- mêrane serê xwe daniye...*

*Carna min tirê!..*
*Min tirê carna!..*

*Lê ez, wextekê ji her tiştî der,*
*Pey evan salên temenê xwe ra,*
*Îro rabûme (mîna xwe cara!)*
*Ketme govendê-*
*Destekîm destê hezar zanan da,*
*Lê destê dinê- yên hezaryekî*

*Bi nezaniya xwe pê av circirk in...*

*...Gelêm ji mêj va xwedî pênûs bûye,*
*Û j'berê pêş va ewî dirozge l'pênûsê kirye*
*...Û ew parastye...*

*...Û ez jî, wiha, pênûs dest min da*
*Bêyî hemdî xwe-*
*Wek masiyê hînî av-çeman bûbe,*
*Wek bazê hînî perwazan bûbe...*
*Wek şêrê hînî nêçîrê bûbe...*

*Na, tu cara ez nikarim, bira,*
*Bêy vê pênûsê we ra bipeyvim!..*

**Rêbendan- reşemî, 1984, Yêrêvan- Sîpan**





# POÊT Û RÛDAN

*Hinekan, ji bo ku bibine poêt,*
*Rûdan berdane,*
*Lê hinekan jî ji ber vê yekê*
*Terka pênûsê- helbestan dane-*
*Pênûs danîne... nenivîsîne,*
*Ji ber ku niha*
*Poêt, nepoêt tev bûne "poêt"...*
*Herdu jî wek hev*
*Ne rast in esseh...*
*Divê yên pêşin pênûsê hildin-*
*Ne ku wek poêt...*
*Lê yên dinê jî ji wana "hîn bin",*
*Çika pênûsê çawa "digirin"...*

**Rêbendan, 1970., Yêrêvan**

# POÊTÎKA

**(Bi fen)**

*Hinek rabûne,"xeta" "rêz dikin",*
*Û wan merem e- "bibin" helbestvan...*
*...Dibek ewan hê tê negihîştine,*
*Ku her ji tengiyên daykên poêtan*
*Poêt tên dinê...*
*Û ew jî paşê bi sewdayê xwe*
*Rêz û berheman me dikin xinê...*

**Gelawêj, 1969, Pampa Kurdan**



# KALKÊ MIN

*Kalkê min darkê duê çê dikir,*
*Çêdikir- nexş û kêrtik lê dikir,*
*Darik hildida, dua lê dikir*
*U bi destê xwe- bi dîndara rem,*
*Darik li stuyê berxê va dikir.*

*Koziyam giran e,- digot,- ya Rebî,*
*Min qazenc kirye tim bi helalî*
*Û neêşandye dilê tu kesî,*
*Tuje mî, bizin, kar û berx bike*
*Evê koza min- çiqas dikarî.*

*Kalkêm sibê zû- pencê tavê ra*
*Derî vedikir, derdiket derva-*
*Xêr û aşîtî dixwest tevan ra,*
*Paşê-baristan vedigerya mal*
*Û slava xwe dida nefera...*

*Ewlê baharê kalkê min hercar*
*Cot û nîrê xwe amade dikir,*
*Guhê gê digirt, berbi nîr dibir*
*Û bi helalî, sidqê xweyî qenc*
*Dest bi çandiniya wê salê dikir.*

*Kalkêm biharê zû hişyar dibû,*
*Tim bendî ra û tivdîra xwe bû*
*Bi cot û kotan berb zeviyê diçû,*
*Li wir berê xwe roê da dikir*
*Û wisa dest bi roja wî dibû...*

*Havîna dereng kalkê min dîsa*
*Bi çakûç- sindiyan, kêlendî- desan*
*Diçû ber zeviyê tev kinêz- kesan*
*Didirût heya teştiya mîranî*
*Paşê ber sivê rûdinişt hêsa.*

*Û sal- dimdêre kalkê min timê*
*J'mirov û xwedê razî û xinê,*
*Guhê wî li ser bextê Cîhanê,*




*Merdane-comerd derbazî dikir-*
*Mêla wî berbi cot û çandiniyê.*

*Kalkê min weha merdane dijît-*
*Ewî radikir, diçinî, davît*
*(Û bextewarî di wê da didît!)*
*Lê di nav cînar, qewm- pismaman da*
*Ewî zoraya yekîtiyê didît.*

*...Kalkê min darkê duê çêc dikir,*
*Çê dikir- nexşê kurdî lê dikir,*
*Bi kêrtik pencên Royê rêz dikir,*
*Bi dîndara rem j'xwe û xwedê razî-*
*Darik serfêza dêrî va dikir...*

**Gulan, 1986, Sîpan**



# EZ EV IM...

*Kixmêr[13] im- reş im, sor im-*
*Çî j'kêrane?*
*Afxan im- dûşman im, an mucehêd-*
*Çî j'kêrane?*
*Ez kurd im- êzdî, yan misulman,*
*Çî j'kêrane?*
*...Bihêlin, qurba-*
*Ez ez bim-*
*Sor bim,*
*Reş bim,*
*Dûşman bim,*
*Mucehêd,*
*Êzdî bim,*



*Misulman!..*
*Çi j'kê?!*
*...Kurd bim-*
*Berêm l'Lalişê,*
*Quraǹ, yan Êncîl*
*Di destê min da!..*
*Yek e-*
*Her kurd bim!..*
*Bihêle, qurba,*
*Bila ez bijîm-*
*Ça dijîm, heme!*
*Bixwazî, ev im,*
*Nexwazî, ev im-*
*Ez im-*
*Ez kurd im,*
*Kurd im,*
*Kurd im,*
*Kurd!*

**29. 07. 1990., Yêrêvan**



# DROZGA ROJÊ

*Ca me binhêrin- me û vê rewşa lêp,*
*Wexta li jorê l'rû me dikenin,*
*Wexta li jêrê l'rû me dikenin*
*Û j'me ra dibên: "Hûne pir baş in...*
*Lê hûn hûn nînin,*
*Hûn û birên xwe ne yek in, zanî?"-*
*Û em jî (kancik!)*
*Dibêjin:"Rast e,*
*Eme cuda ne,*
*Başî û qencî em in- em cuda,*
*Em û birên xwe ne yek in, bira!..."*
*Û li vir kenê mirîşka petî*
*Me û vê rewşê tê...*



*Û tu nizanî bikenî, yanê*
*Rûnêyî, j'xwe û derdan ra bêjî...*
*Ev rewşa me lêp,*
*Ev dor- berên lêp*
*Û ev dostiya lêp,*
*Biratiya tune...*
*...Kortî- femkoriya hinekên nav me...*
*Ya Xwedê, dîsa yeke xêr bikî,*
*Me j'xax û bendên xirab xweybikî,*
*Lê gunhê evên ev yek hunertî*
*Bi mêzîna lêp tucar nepîvî,*
*Çimkê qe lêpî û mêzîna lêp*
*Tu hevdu nakin...*
*Di jiyanê da lêpî û rastî*
*Cotgaê nîr in:*
*Ew tim cot diçin...*
*...Ya Xwedê, qe na, dîsa emir da*
*Tu ji kirên lêp hinekî dûr bî!..*

**Kewçer, 1988., Yêrêvan- Sîpan**



# Û EZÊ WANA ÇAWA RIZGARKIM?..

**"Axir ez çawa**
**Rabim û herim?.."**
Hamo Sahyan

*Evan zarokan ez kuda bibim?*
*Û ça rizgarkim?*
*Ca l'wan binhêrin: çav û brûyên wan-*
*Pêda kurdî ne!..*
*Lê ev zarongan kurdî nizanin,*
*Ew nizanin, ka kalê kalên wan*
*Ça wergirtine,*



*Çawa strane,*
*Bi çi zimanî sowbet kirine,*
*Bi çi rabûnê û rûniştinê*
*Ewan kurd mane...*
*Û d'kîalî da ezê van bibim?!*
*Ca hûn binhêrin-*
*Ew stranên xwe bi xwe nizanin,*
*Lê hineke din bi wan stranan*
*Xemlê didin xwe.*
*Ew govendên xwe bi xwe nizanin*
*(Û şerm jî dikin, jê vedikişin!),*
*Lê hineke din îro bi wana*
*Şa û serbilind lê bûne xwedî!*
*..."Koçerîyê" bêjim, yanê "Tenzerê",*
*Yan "Dilêm, yeman!"?...*
*(Ax, dilo, yeman, ax, kurdo, yeman!)*
*Heya di şîna mirîyên xwe de*
*Yên me distirên...*
*De îja were, kurd bimîn, zarok!*
*Zar û ziman jî hêdî dihele...*
*Lê em tunene*
*Û em tunene!..*
*Ewan me bi xwe ji me didizin,*
*Lê em tunene-*
*Tunene... Tune!*
*Tune- j'bona xwe!..*
*Bi xwe em i'xwe ra*

*Ne hebûne û...*
*Ne jî em hene!*
*Dibhên?- "Tunene"!*
*Îja em ewqas, gelo, biçûk in,*
*Ku me nabînin?..*
*Na!*
*Na û-*
*Hezar carî na!*
*Ew bi wê yekê*
*Di nava me da*
*Xût me dikujin-*
*Me û gîyana me,*
*Me û ramana me!*
*Çimkê, eger- na:*
*Zêndî bin, mirî,*
*Ew j'me ditirsin-*
*Eger em hebin,*
*Li rex wan- ştaf,*
*Kaw û serbilind*
*Em bisekinin,*
*Sîya meyê wana*
*Bi xwe veşêre!..*
*Lê wa hêsa ye-*
*Em îro bûne sîya hinekên din,*
*Sîya sîya hinekan:*
*Hêsa- bê cefa*
*Yekheb dihelin...*



*Dibin bişavkên keşkên bişaftî...*
*......................................*
*Îja dibêjin- bive, rizgarke!*
*Ezê vana wa kîalî bibim,*
*Çawa rizgar kim,*
*Eger her yek di hindava xwe da*
*Evê nebîne?!..*

**14. 06.1989. Yêrêvan**



## ÊLÊGÎA

*(Ji bo bîranîna Yilmaz Guney û Cegerxwîn)*

**"Eger bibînî-**
**Jorda ji esmîn**
**Stêrkek rijya**
**Berjêr hate xar,**
**Bizanbe- merîk**
**Ji cîhanê çû-**
**Bê hêvî- bêçar..."**
**(Ya gel )**



*Eger bibînî- melûl rûniştî, ez kûr dinalim,*
*Bizanbe- esseh li Kurdistanê stêrkek rijya;*

*Eger bibînin, purçîyê min kirye û beşerreş im,*
*Bizanbin, ruhêm sehdetiyê dide, l'Welêt hewr e:*

*Ruhêm esmanê Kurdistanê ye, stêrk lê pir in,*
*Her yek li wira yaziuya wî heye,- stêrka wî geş,*

*Û, wexta caniyê hinekên wana zû diqurçimin,*
*Li esmanê min stêrk dirijin- dibe şevereş...*

*Îro li welêt şîn e dubare- kurd tev xemgînin*
*(Min digo- ruhêm çendeke wisa çima dizare?!):*

*Îro Kurdistan lawen xwe mezin- Guney û Cegerxwîn,*
*Bi dilekî kul berb heta-hetê wê verê dike...*

*...Ji îro hada bo Dayka kurdan kîê bistirê?!*
*Bo Kurdistanê kîyê l'welatan dayne dew- dozê?!*

*Ji bona mirov, roj- xiyala wî ji îro hada*
*Kîyê fîlmên xwe d'hebsan da derxe û bide rêzê?!..*

*Li esmanê min du stêrkên geş bûne kêmasî;*

Ji derdê wana wê kûr dinale Kurdistana min,

Û ez jî îro lêdixim- diçim- heznî û dilşkestî,
Ber mezelên wn- bihurtî- bihuşt, sergerden dibim...

.......................................................................

Li Kurdistanê gelek- gelekê peywe ra rabin,
Lê hemû cîhạn wê ji bîr neke nav û dengê we,

Gelek stêrkê li esmanê min dîsa geş vedin,
Lê ew ronahiya wan stêrkên we dîsa cuda bûye.

**Avrêl, 1984., Yêrêvan- Sîpan**





# EZ Û "EWAN"

*Ez nîşan dam, gotin- dîn e?!-*
*Gotin,- ca lê binhêrin!*
*Hemû bendî mal û hebûn,*
*Ew bendî "zên- zanebûn"!?..*

*Ez nîşan dam, gotin- kor e?-*
*Gotin- mirov wa dibe?*
*Peywir[14] danê, lê ew diçe,*
*Ça dikin, pê nikarin!*

*J'mira gotin, ku bê ruh im,-*
*Gotin- ca van bedewan!-*
*Guve ez ji wan direvim,*
*(-Ew jî bedewne çawa!)*

*Yekî jî got- li dora wî*
*Bedewan çît girtine,-*
*Boy min tune mal- avayî-*
*Ewan sewdêm birine!..*

*Gotin- eva xeta emir e,*
*Maç[15] girtin- dan destê wî,*
*Lê wî cotê xwe şo kirye,*
*Mêl bûye j'xeta "vî emrî".*

*Hinkan gotin- bigrin, bînin,*
*Bila l'bal me kedî be,*
*Emê bi tev rabin- rûnîn-*
*Bila "telîmê" hilde!..*

*Yekî jî go- raqetînin,*
*Ew ne layîqî me ye,*
*Em wê cîhanê bêş dikin,*
*Lê ew b'derdê dinê ye!?..*

*Yekî go- nikare, Rebî,*
*Cilek pak jî li xweke,*
*Cil û pêlav tev hizhizî-*
*Kesek poz li wî nake!*

*Hinekan jî go- dibînî,*
*Çito cilan xwe dike,*



*Cil û pêlavke wergirtî-*
*Poz li kesekî nake!..*

*Û heyaynî pismaman jî*
*Berê xwe j'min guhaztin,*
*J'xelkê ra bûn se û tajî-*
*Pêlavkên wan alastin...*

*Dane defê- weke nemam,*
*Bûne dengbêjên xeybê...*
*Xelkê xerîb bûne pismam-*
*Dest dane min vê demê.*

*Ê ku ta du bi rûvîtî*
*Ji kaniyam av vedixwar,*
*Kevir hilda- bi nemerdî,*
*Avêt kaniyê- hov û har...*


*Her yekî wa- çi karibû,*
*Şer û şiltax l'min kirin,*
*Gotin, gotin, gotin û çûn-*
*Tu tişt b'xwera nebirin...*

*Û ezê wa, d'cîhanê da,*
*Metel l'dor xwe dinhêrim*
*(Ê, ya Rebî, mirov jî wa!?)-*
*Û d'riya xwe da merd diçim:*

*Ezî bendî merd- merivayê,*
*"Ewe" bendî kara xwe,*
*Em tev jî wê berb cîhanê*
*Diçin- her yek b'cûrê xwe.*

*...Û ezê têm- minê dergê*
*Ruhê xwe xweş vekiriye,*
*Merd gav didim û cîhanê*
*Didime ber dilê xwe.*

**Rezber, 1984, Sîpan.**





## ELEK- BÊJING

*...Elek- bêjinga demê çûye- hatiye,*
*Elek- bêjinga demê livyaye...*
*Neçê- netiştok lê hatine hev:*
*Qelş û qulên wê hey anîne hev-*
*Hê hûr kirine (Ji bo hûrên xwe!)*
*Û yên here hûr jê derbas bûne-*
*Yên here hûrik!..*
*Lê ewên nîvçe l'şûna yên mezin*
*Li ser tora wê wan xweykirine-*
*Ça yên here gir,*

*Weke giregir...*
*...Lê yên giregir*
*Wan weke serçeq*
*Ji ser dirtine-*
*Bê xem û minet wêda rêtine...*
*Wisa giregir ji ger- aqarên*
*Vê jiyana me êdî der mane...*
*Û ewên nîvçe,*
*Yan ên here hûr-*
*Neçê- netiştok*
*Roj- nava rojê*
*Weke giregir me têne xuyanê...*
*Û em hey wisa*
*Hînî netiştok- neçêyan bûne...*
*Jiyana me hey*
*Hatiye ser reng û rûçkê*
*Wan netiştokan...*
*De îjar were, evê jîyanê*
*Careke dinê elek- bêjingke...*
*De rabin- her yek-*
*D'hindava xwe da*
*Zû bikin- bidin elek- bêjingan!...*

**Kewçer, 1988., Yêrêvan**



## RÊPORTAJ

**(9'ê gulana 1985'an, Yêrêvan,**
**Bindarûka Serkevtinê)**

**"...Hemûyan- nav bi nav-**
**Bînin bîra xwe!.."**

**Robêrt Rojdêstvênskî**

*Sala hezar û nehsid çilpêncan!..*
*Sal bihurîne...*
*Û, wiha, îro-*
*Piştî ewqas sal...*
*Bindarîkek merd...*

*Li her aliyan mirov diçin- tên,*
*Distrên, dikenin,*
*Govend girtine û dirqisin...*
*Çardorê hêle û hingirme ye-*
*Şabûn û şadî ye, şadîya gel tevî...*

*Çil salî berê!..*
*Gelekên wana berî çil salî,*
*Wek pehlewanên wan dewrên çûyî,*
*Ji bo welatê xwe biparêzin,*
*Mirinê ra merd çûne gulaşê...*
*Gelekên wana bi serkevtinî*
*Gihîştin lana faşîstên devxwîn...*

*Û îro jî ew hatine vira:*
*Li vir civyane ji her netewan-*
*Rûsî û kalmîk,*
*Gurc û ermenî,*
*Ûkraîn û tacîk,*
*Kurrd û polonî...*

*Ew berev bûne, wekî tevayî-*
*Tev wan hevalên dema wî şerî*
*Wan rojên xweye dijwr û pir teng,*
*Wan rojên xweye girane bi ceng,*
*Wan rojên xweye sar û bêsitar-*



*Birçî û bê çar...*
*Û wê roja xwe - ya here ronî-*
*Ya serkevtinê bi tev bînin bîr...*

*Ewê bîr bînin!..*
*Û ewê dîsa pey rêça ewan bîrî- mitalan*
*Dîsa b'tevayî,*
*Dîsa b'lehengî herin- derbasbin...*
*Û, were, binhêr, sîngên wan tevan*
*Bi cûre- cûre mêdalyonan va xemilandîne...*

*Tu hewas dikî li wan û dîndara wan cefakêşan*
*(Cefakêş bêjim, yan peyveke din-*
*Yeke hê bilind?!),*
*Ewê dîndara ewan kedkaran,*
*Ewê dîndara wane westyayî,*
*Lê pir bextewar- jijiyanê têr,*
*Tenê binhêrî!..*

*Xemla wan tam e,*
*Bejn û bala wan-*
*Li ber çavan e...*
*Lê her yekî wan*
*Tiştekî xweyî ku wek dîyarî*
*Ji Xwerista dê li bal wan hebûye,*
*Li wir hiştine-*
*Yekî destê xwe,*

*Yekî nigê xwe,*
*Ê hem dest, hem nig...*
*Hinekan jî çav...*
*Û ew dîndara bedewîya mirov*
*Li wir hiştine...*

*Û dibek îro ewana êdê j'bîr jî kirine,*
*Çika wî çaxî ew dîndara wan*
*Çi teherî bûye...*

*Ewana ew tev bê gazin û heyf*
*Li wir hiştine...*
*Ji bo îro em karibin hebin,*
*Bijîn û hezkin,*
*Xwe b'xwe bi pê xwe cîhanê levxin...*
*Ji bo îro em vê jîyânê da,*
*Çi ku ewana di dema xwe da*
*Kêmasî hiştye,*
*Pê negîhandiye,*
*Bikin, derbaskin...*

*Ji bo îro em bi van destên xwe*
*Şûna wan destan (Hem jî ber wan va)*
*Sazkin û şênkin,*
*Çêkin, bedewkin vê jiyana xwe...*

*Ji bo em îro bi evan destan*



*Dest bidin destê heval- hezkiriyê*
*Û jiyaneke nû avabikin...*
*(Dibek destên wan wisa jî hingê*
*Hesreta kezîyên evîna xwe man...)*
*Ji bo xût naha bi van çavên xwe*
*Tiştên ku çavên wane wî çaxî*
*Îro nabînin, em pê heyrî bin...*


*Û paşê...wekî di jiyanê da*
*Şûna wan xortan*
*Ji bo jiyanê em bîndin, karkin,*
*Ji bo kîjanê wan canya xwe dan-*
*Venegeryan mal...*

*Wekî îro em bi evê heyîk û karê xwe va*
*Dewsa xemên diyên wana tujîkin...*

*Û ji bo vê jî, werin, îro em*
*Tev evan egît û van lehengan*
*Cejna xwe bikin,*
*Wan pîroz bikin,*
*Lê yên ku îro ne amadene-*
*Wê êdî neên,*
*Bînin bîra xwe,*
*Tucar j'bîr nekin!..*

**Gulan, 1985., Yêrêvan- Sîpan**

# ÇEREZÊN MITALAN



*

* *

*Jiyanam xewn e,*
*Cîhan tev xewn e,*
*Û ev xewna*
*Min sêwirandye...*

**Rezber, 1979., Karçaxpyûr**



# PÊLÊN JÎYANÊ

## I

*...Pîrediyam xwezî li bal min bima:*
*Ez êvar- êvar bihatama mal*
*Û serê xweyî westiyayî- giran*
*Daniya li nava ber- pêsîrên wê...*
*Û mîna hêna xewn- zarotiya xwe*
*Diya min ji min ra "Lûrî!" bigota:*
*Ez biketama xewa hingorê-*
*Ez têr razama, ez hêsa bûma*
*Û ji giranî- qirêja rojê*
*Ez paqij bûma- bibûma tifal...*

## II

*...Dibek lema jî, wexta her mirov*
*Êdî kal dibe û di jîyanê da*
*Êdî diweste- tutar dikeve...*
*Û, çimkê êdî dayka wî tune,*
*Ew careke din paşda vedgere...*
*Nav paşla Xweliya dayka me tevan.*
*Û Xweliya dê jî b'merd- merdane*
*Ber- pêsîrên xwe li ber vedike...*
*Ji bo ku paşê, dem bibihurin,*
*Ew mirov car din ji diya xwe bibe,*
*Lê êdî ne ew- tifalekî din,*
*Ji dêke dinê- wekila diya wî...*

## III

*...Her kesekî me di jiyanê da*
*Yekî j'pêşên xwe,*
*Yan pêşê pêşan diwekilîne...*
*Lê her carê jî tiştekî nuh û*
*Newekilandî di jiyanê da*
*Li me yan zêde, yan jî kêm dibe.*
*Û em her carê têne guhertin*
*Û em her carê em bi xwe nînin...*
*...Wekî ez bi xwe*
*Wekilandina pêşîkî xwe me,*



*Ez wê dizanim*
*Lê, wekî dîsa ez ji pêşiyên xwe*
*Gele- gelekî başqe- cuda me-*
*Tiştekî kêm im, tiştekî- zêde,*
*Ez wê jî zanim...*
*Lê, gelo car din Xwerista me dê*
*Wê b'çi şivêtê me derxe dinê?!..*
*- A, eva yeka minê bixwesta*
*Pê bihesiyama:*
*Nîvê jiyana xwe minê bida,*
*Ji bo bizanbûya,*
*Ka minê çawa- bi çi rê- dirban*
*Di nav Xwerista dê da çerx bida*
*Û vegeriyama li rû Cîhanê!..*
*Nîvê jiyana xweyî dinê jî*
*Minê bida ewê rihînê,*
*Ku bikaribûya wî tifalî ra*
*Bi xewn- xiyalan ez nas bibûma...*

**Rezber, 1985., Sîpan**



## DIBÊJIN..., DIBÊJIM
**(Êkspromt)**

*...Dibên- ewî stuxar e,*
*Yê ku sêwî- bêdê maye...*
*-Kurd bi te xweydê ye, Welat!*

*Dibên- bihê wî qirşek e,*
*Yê ku bêyar- bêevîn e...*
*-Evîna kurd tu yî, Welat!*

*Dibên- mirov hêsîr dibie,*
*Wexta j'çavan merûm dibe...*



*Ronahya kurd tu yî, Welat!*

*...Erd û esman mirov tên hev,*
*Wexta nikare bilive...*
*-Tu qudûmê kurd î, Welat!..*

.........................................

*...Wexta halêm xerab dibe,*
*Wexta dilkê min qul dike,*
*Wexta xudaneke xêran*
*Tune- j'min ra bêje: Lawo!-*
*Wexta cîhan li min tê hev-*
*Têda tenê - bêheval im...*
*Wexta ronahiya çavên min*
*Ditemire- çarçav dibim,*
*Wexta qudûmê çokên min*
*Dişkê, û ez berpê dibim...*
*Dibêm: Bila Welat xweş be,-*
*Û wê demê tu têyî, Dayîk,*
*Tu têyî j'mira hub û evîn,*
*Wek qudûmên herdu çokan,*
*Wek ronahya herdu çavan...*
*Teyî û min ruhdar dikî-*
*Ruh l'ber qefesa min da tê,*
*Qudûm dikeve çokên min,*
*Çavên mine marûmbûyî-*

*Cîhan têde ronî dide...*
*Û carek din ez radibim-*
*Weke bengîkî sewdaser,*
*Sewdaserekî evîndar*
*Bi te dijîm,*
*J'bo te dijîm!*

**22. avrêlê, 1992. Sîpan**





## BEYT-BINYAT

*...Riya emrê me vedirese,*
*Riya emrê me vedirese...*
*Badek- badek vedirese riya emrê me...*
*Rêça emir pey me mîna,*
*Rîsa guloka vekirî,*
*Me û emrê,*
*Qey d'eynê da,*
*Dide kivşê.*
*/Lê ew- paşê!../*
*Û her carê-*
*Her fitlekê, çivanekê-*
*Qenc, yan xirab,*
*Ku em diçin,*
*Her carê jî metelmayî û bi gazin*
*Roja xweye derbasbûyî*
*Em dinihêrin*
*Û b'gazin in,*
*Digazinin-*
*Guve çima wiha bûye,*
*Ne ku- wisa,*

*Guve dîsa duh hê xweş bûye,*
*Ne ku- îro!..*
*-Digazinin,*
*Em b'gazin in-*
*Çima?*
*Çima?*
*Çima, divê...?*
*Lê, çaxê ku ew jî diçê,*
*Derbas dibe,*
*Û çivanek dinê tê û*
*Destpê dibe,*
*Dîsa ew tas, ew taraq e;*
*Dîsa gazin...*
*Dîsa roja derbasbûyî dipesinin...*
*Dîsa derdê roja sibê,*
*Yan roja ku*
*Hê nehatiye û wê hê bê...*
*Fêl û finyaz û binyata mirovan e-*
*Ha b'gazin in,*
*Digazinin-*
*Guva emir û yazya me*
*Wê nadine me,*
*Çi ku divê esseh bidin,*
*Çi hêja û anegorî*
*Merîfet û sewdê me ye.*
*A, l'vira ye,*
*Ku dixwazî esseh bêjî:*



*-Nebû, bira,*
*Êne heqî wisa nîne!..*
*Eger pirsa anegoriyê tînî navê...*
*Bi extyariya te camêrî*
*Divê bêjim:*
*-Pêşda, heya ji cîhanê,*
*Ger tiştekî tu bixwazî*
*Û daxwaza xwe diyarkî-*
*Li malê be, yan li derva-*
*Di nav êl û eşîretê,*
*Yan goveka hê fireh da,*
*Eger heqiyê tu dixwazî*
*Pê bihesî ,*
*Te çi daye,*
*Ku deynê xwe tu dixwazî*
*Û nikarî paşda hildî?*
*Wekîsane, were, bira,*
*Em d'sêrî da wa qayîl bin-*
*Berê pêşin- roj in, wê bên*
*Û derbas bin,*
*Hineke qenc,*
*Hinek xirab,*
*Roj in, wê bên,*
*Bibuhirin...*
*Lê paşê jî,*
*Wê hela hê biqewime,*
*Ku yên neçê*

*Dewsa yên çê wê bigirin,*
*Wê yên nezan*
*Ser zana da hê biqûjin,*
*Xêvên semme*
*Wê hela hê*
*Dersê bidin mervên aqil,*
*Û aqilê ji wan "hînbin"...*
*Lê tu li vir j'kê gazin î?*
*Her gunekar ez û tu ne...*
*Belê, belê, ez û tu ne,*
*Ew in, em- gişk!*
*Ku dikarin*
*Tenê rûnîn-bigazinin...*
*Û, ku dem tê,*
*Em destê xwe*
*Tewer dikin, hê ne bes e,*
*Hela d'ser da disekinin*
*Û pesn- metihê "wana" didin...*
*Guve, eger "wana" nînbûya,*
*Rewşa meyê pir xirab bûya,*
*Guve, eger "wana" nînbûya,*
*Pêşmergan li Kurdistanê*
*Wê hêzên xwe bihiştana*
*Û biçûna!..*
*Eger, guve!..*
*Guve, eger!..*
*Û pey ra jî hêsîr- metel*



*Em rûdinîn*
*Û lûrika dibarînin-*
*Guva, çima?*
*Guva, çima?..*
*Na, na, bira, wisa nabe:*
*Tu tişt jî qe wî cûrêyî*
*Ne dikare xirab bibe*
*Û ne jî- çê!*
*Hinekî zû, yanê dereng*
*Gelek tiştê d'vî emrî da*
*Rast bin, esseh...*
*Lê dîsa wê her tiştê wa:*
*Mîna rûnekî heliyayî,*
*Wiha safî û awakî nesekine,...*
*Çimkê, eger wisa bibûya,*
*Emrê d'cî da bisekinya,*
*Kela jiyanê wê tunebûya.-*
*Xweristê da qet nikare*
*Her tişt qenc be, yanê - xerab:*
*Li rex qencan hem jî xirab ger tunebin,*
*Qencê xwe li qenciyê negrin!*
*(Evê yekê, helbet, zanim,*
*Ji min baştir esseh zanî!)*
*Wekîsane:*
*Were dîsa berê pêşin*
*Ez û tu va bêjin, ku em*
*Ji wê "qenciya" ewan başan*

*Spas dikin!*
*Lê eger ew qet tunebin,*
*Wê qencîke hê mezin be...*
*Û lema jî,*
*Berê-j'berda min tim gotye:*
*- Gizîka xwe ji wan kesan*
*Ez vedizîm,*
*Yên ku tenê*
*Bona nevsa caniya xwe ne,*
*Ku l'rû dinê hene, dijîn...*
*Yên ku hem heval- hogirên xwe,*
*Hem xwîşk- biran,*
*Hem jin- zaran*
*Û dê-bavan...*
*Heya here derê Welêt,*
*J-xwe ra nêzîk û hizkirî*
*Hesab dikin,*
*Heya kara wan ji van tê:*
*Eger sibê kar û qencî bimiçiqin,*
*Ewê j'xwe ra xal û xûçên teze destxin!..*
*Ya dinê jî:*
*Ew e, bira-*
*Riya emrê xwe, çiqas diçe,*
*J'alîkî va em wa hêdî-*
*Her kesê me guloka xwe vedirêse,*
*Û hema ji wî alî va-*



*Pê- pê l'pey me,*
*Hineke din*
*Ji wî rîsê dewr- zemana cêwribandî*
*Guloka xwe (nuh û paqij)*
*Bi hemdê xwe vedipêçin,*
*Ji bo paşê, wexta dem hat,*
*Ew jî hema mînanî me*
*(Lê b- cûrê xwe!)*
*Riya emrê xwe-*
*Badek- badek veresînin...*
*Wekîsane:*
*Ya lap paşin û kutasiyê-*
*Hema ji bo xatrê wana-*
*Bo wan, yên ku wê pey me bên,*
*Were, riya xwe- herkesê me,*
*Wisa here û derbas be,*
*Ku li pey me*
*Rêke durist û tendurist*
*Her bimîne!..*
*Ji bo dewê-k me temandiye,*
*Peyhatiyên me netemînin!*
*Û j'xeynî wê... wekî paşê...*
*Nebê-*
*Negot?!*

**Gelawêj, 1984., Sîpan- Yêrêvan**

*

* *

*Wexta bimirim, wexta bimirim,*
*Min bi çardarê hûn bibine gund,*
*Mirin û mode qet hevdu nakin-*
*Hûn dara gûzê nekine tabût!..*

**7'ê reşemîyê, 1986, Yêrêvan**



# XWEMUKURHATIN

**"Şivan bûma ez-**
**li wan çyayên dûr..."**
Vahan Têryan

*Poêt avijîya xwe li şivîn anî-*
*Min xetên wî xwendin û ez metel mam...*
*Poêt avijîya xwe li teyr û tûyan anî-*
*Dilêm kir bifre, lê ez metel mam.*
*...Û ez metel mam... Û ez d'cîda mam...*
*Û min zordestî l'mitala xwe kir...*
*Û mitala min hat... şuhurandin.*
*Kî bû gunehkar?!*
*...Û sal bihurîn...*
*Û çax û dem jî hatin guhertin!*

*Û mitala min- wek qîza kezî,*
*Û mitala min- wek keça bikur,*
*Paqij û bê sur- car din hişyar bû...*
*Û îro ez jî xwezîya xwe li her*
*Şivanî tînim,*
*Û îro ez jî xwezîya xwe li her*
*Teyr û tûyan tînim!*
*Gelo wê kengê azadîya me bê,*
*Û emê bi xwe ji xwe azad bin...*
*Em dîlên emir,*
*Em- dîlên demê,*
*Dîlên dor-beran...*
*Dîlên xwe bi xwe!...*
*Gelo wê kengê azadîya me bê?!...*

**24. 05. 1990. Sîpan- Yêrêvan**





## HINKÎ- HINEKÎ

*Ev erş û esman û erd jî pêra,*
*Sêwra min û te, wexta Xwedê da,*
*Nav her yekî da şêwirek danî-*
*Her yek nexşekî erşê bêbinî.*

*Û ew nexş û reng- xemlek seranser-*
*Ji cîhanê ra rext, qaş û kember;*
*Çiqas jî ewan ji hev cuda bin,*
*Hemû tevahî xemlekê didin.*

*Û her mirovek xemlek cîhanê-*
*Bi kêm- zêdahîyan, ku dibin xinê,*
*Bi wan cudatîyan- çawa dîdarek,*
*Dibe nexş- awaz, dibe nîgarek...*

*...Û, ger bixwazî cîhanê naskî,*
*Pêwîst e, qeya mirov firqaskî:*
*Di nav tevan da tu hilîne min-*
*Çawa nexşekî erşê bê ser-bin...*

---

*...Hinekî dîn im, hinkî- evsene,*
*Hinekî xêv im, hinekî semme;*
*Hinekî nebî û aqilbend im,*
*Hem jî şereza û zanîyar im;*

*Hinekî feqîr, hinekî hêsîr,*
*Ezî nivîşkan û bêtaqet im...*
*Hinekî gewre, hem jî ejdeha-*
*Ez cihanpenah, mêr û mêrxas im;*

*Hinekî kafir, hem jî bêxwedê;*
*Û tim xwedênas- ziyaretparêz im...*
*Carna bedewhiz, hem jî dilçivîk*
*(Û bengî dibim cîyê tuyî netê!)*

*Hinkî xweheyrî û xwebengî me:*
*Carna direvim ji van bedewan...*
*Û b'van tevan va ez bi xwe dijîm,*
*Tevî van tvan ez b'xwe ra dijîm...*

*Û, gelî mirov - cîhanvanên min,*



*Metel nemînin, eger ez carna*
*Her tenê dîn bim, yan bi sewda bim,*
*Yanê tirsonek, yan jî mêrxas bim;*

*Yanê kafir bim, yanê xwedênas,*
*Yan dilçivîk bim, yanê xweheyrî ,*
*Yan jî pozbilind û xwebengî bim...*
*Û l'çardorê xwe ez we nebînim.*

*Lê, ger ji tirsa "horîyên" dojehê*
*Ez revoguro ji we jî ta bim,*
*Hûn nexeyîdin, dotên serbilind,*
*Mirov bi vana hema mirov e...*

*Nav van tevan da ez xwe digerim,*
*Û j'nav van tevan ez xwe dibjêrim,*
*Herçê ne hêja ez yeko- yeko*
*Ji hev dibjêrim, wêda davêjim...*

*Çiqasî karim- sade û paqij,*
*Weke merîkî hinkûfî merîyan,*
*Berbirî we têm,*
*Berbirî we têm!...*

**12. 06. 1988., Yêrêvan**

# NAN

*Pêşiyêm gotine- Ez vî nanî kim,-*
*Û tucar xêlif sond nexwarine,-*
*Nan e,- gotine,- dîn- îmanê min!-*
*Ez vî nanî kim, rast jî wisa ye...*

*Wexta parî nan l'ber piya ketî bûye,*
*Tiya bûye, hildaye pêşyê min bi xof,*
*Hildaye ew nan û ramûsaye-*
*Hatiye ber çavan best- beyar û şov.*

*Pêşiyêm zanibûye qedrê nanê xwe,*
*Çimkê şev û roj ruh daye xweliyê:*
*Wî xwîn û xwîdan, hemû hêza xwe*
*Daye zeviya xwe û hatiye malê...*

*Bahar- havînê ew her carê jî-*



*Hişkayî, lêyî û teyrokê ra*
*Hatiye şêr, ji bo zeviya wî bijî,*
*Û nan gîhandiye zarokên xwe ra.*

*Ked û xwîdana wî bûye nanê wî,*
*(Ked jî, hûn zanin, çiqas şêrîn e!)*
*Ewled jî wisa şîret kirye wî,*
*Ku weke Xwedê nên bihebîne.*

*Nan temê herî- herî bihuştî-*
*Belê, pêşiyên min nan parastine,*
*Çimkê d'nav nên da- tam parzinandî*
*Berê xwîdan û karê xwe dîne...*

*Nan cefê wan bûye, nan bêxewî bûye,*
*Nan xwîna wan bûye û jîyan bûye nan,*
*Nan rûspîtî bûye, serfinyazî bûye,*
*Hem jî hêvî bûye û tiberk bûye nan...*

*...Pêşiyêm gotine- Ez vî nanî kim,-*
*Û tucar xêlif sond nexwarine,-*
*Nan e,- gotine, dîn- îmanê min,-*
*Ez vî nanî kim, rast jî wisan e!*

**Pûşper, 1978., Sîpan**

## *GULAŞ*

*Min û nexweşiyê xweş rahiştiye hev,*
*Cîhan li me bûye gera gulaşê:*
*Em wê hela hê l'ber hevdu didin-*
*Hey ew min davê, hey ez radibim...*
*-Gulaşa meyê dirêj bikşîne?-*
*Ez bersîva vê nikarim bidim...*
*Lê, ger carekê semt bikeve min,*
*Pişta wê esseh ezê erdêdim...*

**Adar, 1984., Yêrêvan**

# BINDARÛKA BIÇÛKAN



## GUL Û DOTKA MIN

*Sorgul b'tavê ra zû hişyar dibin,*
*Çavên xweye tên mizdidin hêdî,*
*Dilopên avîyê jê dişirikin-*
*Bela dibin nav gul- gîhên hêşîn.*

*Û lezo- bezo dotka min xişîm*
*Wa valî- walî li min digere,*
*Beşera wê xweş û metelmayî-*
*Çav min dikeve, qiçê vedgere.*



*Destê min digre ew zara sava,*
*Wir kundvedide û j'mira dibê-*
*Bavo, ew çi ne, ser belgên wana*
*Diteyîsin hey, hey têne xarê...*

*-Hêsrên wan in ew, biçûka minê-*
*Hêsrên şabûnê- ne tavê daye!-*
*Wexta tav dertê, ew ji şabûna*
*Kela giriyê xwe zevt nakin îda!..*

*Sorgul berbangê zû hişyar dibin,*
*Çavên xweye ter mizdidin fesal,*
*Lêk pencê tavê wana radmûsin,*
*Xunav û avî j'wan dibin betal...*

**Gulan, 1984., Yêrêvan**



## *STRANA SÊDENG*
**(Ji bo Meyana biçûk)**

### *I*
### *Se:*

*Wexta xwediyê sê (ji ber hêçxemîyê)*
*Kis dikê:- Kute!-*
*Û bi şivdarê l'rexê wî dide;*
*Wexta kevanî (ji ber çila wî),*
*Çi l'ber dêst keve,*
*Hiltîne- davê,*
*Ew dibê: "Xwedê, xwezî gur bûma-*
*Gurê beratê!..*
*Ez sal- dimdêre li çil- çyan bûma:*
*Şevên payîza zerp bizûryama...*



*Daketama gund- ji bo risqekî,*
*Seên gunde dir bidana dû min...*
*Bila heram bin hestûyên didin min...*
*Yan ew kûtê germ,*
*Ê ku carana ewqasî germ e,*
*Ku ez kerbana zincîra xweye*
*Hesinî dikim sare- sar bicûm!..*
*Belkî heram be ev kûçiksantiya*
*Ku ez dibînim!..*
*Wê hê baş nînbûya, ku ez gur bûma-*
*Gurê beratê?.."*

### *II*
### *GUR:*

*Wexta gur- birçî, bê sitar, bê cî,*
*Diçikçikîne ji ba- bagerê...*
*Wexta ew b'roja- tî, birçî, bê tab-*
*Nig binva dibin- çil- çyan dipîve...*
*Wexta b'dizîva, ew bi tele- tel*
*Nêzîkî kerê pezê gund dibe...*
*Û hew dinhêre- qûrtîn li seên gurêx dikeve:*
*Didine dû wî...*
*Hela serda jî*
*Şivan tivingê li dû dirêje...*
*Û ew ji gulla şivîn jî zûtir*
*Dipeke- diçe û winda dibe...*
*Û bi helke- helk gurkî dizûre:*

*-Xwezî se bûma- seê malekê...*
*Bila kevanîyê, çi l'ber dêst keta,*
*Kewkî min kira, bida nifirîya;*
*Bila xwedîyê min, dema hêrs bûya,*
*Bi dar- şivdaran banya rexê min!...*
*Belkî heram be gur û gurtîya min:*
*Di cîhanê da ne gurtî maye,*
*Ne mirovatî!..*

## *III*

## *ŞIVAN:*


*...Kî çi dixwaze, ha bila bêje,*
*Her çiqasî jî hinek bibêjin:*
*Se û gur avijîya xwe li hev tînin,*
*Nayê ber heşan-*
*Yek e, roja wan qe ne tu roj e...*
*Yek e, rewşa wan herduyan weke hev*
*Kûçiksantî ye...*
*Û hê kesekî nedîtye, wekî*
*Gur setîyê bike û se jî- gurtîyê...*
*Divê gur gûr be û se jî se be:*
*Dema gurtî ji gur kêm dibe,*
*Seyên gunde çê li wî col dibin,*
*Didin nava xwe û vediçirin...*
*Lê dema setî ji sê kêm dibe,*
*Ew dibe xurê gurê beratê:*
*Gur bi gurtîya xwe, se bi setîya xwe*



*Di cîhanê da me diyar dibin-*
*Yekî bi oxir, yê din- bê oxir...*
*Lê ya qenc ew e,*
*Ku ne seê tol û ne jî tu gur-*
*Bi oxir be ew, yanê- bê oxir,*
*Pêrgî te neyên...*

**01. 09. 1991., Yêrêvan**





POÊM



# KARWANÊN BÊXEWÎYÊ

*...Ev karwanê vê bêxewîyê dîsa hatye min bûye mêvan,*
*Wê zingîn e û şingîne zengilê wî zîz ber guhê min...*

*Ev bêxewî dîsa hatiye, dîsa beyta xwe dibêje-*
*Ji serhatiya kal- bavên me - tac-hunera wane hêje!-*

*Deve-delûl tê û dikşe- saz- zengilê xwe saz kiriye,*
*Û bêxewiyê berb dewrên dûr rê û rêwîtîk kar kirye:*

*Tê, ber min ra wê dimeşe deve- delûlê dewranbexş,*
*Û zengilê xwe ber guhê min dizingîne bi seda xweş...*

*Rêzên deva tên û dikişin, karwan-karwan bûne şirdan,*
*Karwan-karwan tên- dikişin deve- delûl û bazirgan.*



*Û li pey wan şirdanên nuh tên û dikşin nermik û naz-*
*Mîna refên berbi beriyê- derbas dibin wek qubeqaz...*

*Û pey hev tên, li pey hev tên, dibihurin şirdanên han,*
*Hey zingînin, xweş şingînin ber guhê min zengilên wan...*

*...Çi bêxewîk xweş û şîrin?!- J'xewa hingor şêrîntir e!*
*Xeweke wa- d'bêxewiyê de, dinya ronik jî xweştir e!..*

*...A, wê dîsa karwan hatin- lal û durên sewdê me lê,*
*Lal û dûrên dewr-zemanan- nav- nîşanên pêşiyên me lê:*

*Tên û tînin ewê xeznê- pêra hezar pirs û pirsyar,*
*Û bi rêzê, yek-yek pey hev dur in, ha tên- li devan "siyar"-*

*Ev bêxewî dîsa hatye- xweş şingîniya zengilan e-*
*Dîsa bîrîyên dewrên çûyî aniye l'ruhê min pêçaye:*

*Û ev bîrî bûne karwan, tên- ber çavê min ra dikşin,*
*Û bi rêzê pirs in, hey tên, li ser ruhê min dinicin-*

*Pirs in, û tên, û mînanî bazirganên wan dewranan,*
*Wek karwanên j'rê xalifî- ketibe best û beyaran,*

*Ê ku, çaxê demek hatiye, ji gera xwe pir westyaye,*

*Û hey hatye, û hey hatye, li ser ruhêm şax vedaye;*

*Şax vedaye ser ruhê min wî karwanê bêtab wisa,*
*Wek karwanê ji tab bibe- xwe bavêje oazîsan[16]...*

*Wê îx bûne ser sîngê min devên karwanê dewranbes*
*Û westyayî ewan cî da dihênijin bê dengû hes;*

*Wê b'awakî dixerbilin û dikaên ew devên pîr,*
*Û l'dor wan ra xweş dixare serekkarwan- êgin û jîr,*

*Daye koda çap û pîvan, hatye dora wî karwanî-*
*Cûre- b'cûre jev dibjêre lal û durrên barê anî:*

*Ji têr-xurcên wane dewra durrên anî ew derdixe,*
*Dûrr-cewahran ew derdixe û li ber min xweş radixe...*

*-Eva deve-delûlê min, zanî, ji ku hatye vira?-*
*Serekkarwan min dinhêre,- heylo ji dûr,- dibê,- bira?"*

*Û ev barê hanî giran- ji Navçemka[17] meye bihuşt,*
*Best-beyaran derbas bûye- herçarçar qulbên dinê nehîşt:*

*Eva çendik- çend hezar sal bûye rêwî, ketye çil-çya,*
*Ez jî pêra gorî bûme, neçûme tu mal- avayan...*

*...Û hey hatye, karwan hatye, û firtone lê rabûne-*



*Û firtone lê rabûne- bûne xubar, winda bûne.*

*Û barxanên[18] wext û wedan xwestine me dabelînin,*
*Dabelînin karwanê me, ji rû cîhanê hilînin...*

*Her wext-weda hinda xwe da j'xwe ra tiştek jê çobandiye,*
*Lê çiqas çûye, ew karwanêm ewqas hê pir giran bûye.*

*Û hey pê ra şaxvedaye vî karwanê minî dewran-*
*Şaxvedaye û hey hatye û derketye heylo l'vira,*

*Bê rawestan ew meşyaye, li rû dinê nebûye winda,*
*Û karwanêm dîsa hatiye û hey hatye sal dewran da...*

*Hatye- hatye û îro jî li ber derê te bûye mêvan,*
*Ewê di jiyana we da j'we ra bibe sebr û sikan...*

*Binhêr, bira, li vir çiqas deve, şax û karwan hene,*
*Ewqas qebîl, ber û zarav, hem jî çandên me hebûne,*

*Îro jî tev gihîştne hev, bûne bazirganîke tam,*
*Ji bo li rû vê cîhanê em pêşda bên mered û temam.*

*Evan têr û xurcên han da tiştên hêna Madî hene,*
*Reng- awazên bircên belek, şaneşînên kevnar hene...*

*Lê d'yên han da tê derbarê xet û zarê meye kurdî*
*Hezar û yek surên kevnar û zanînan jê hilînî.*

*Û tu were lê binhêre: evan têr û xurcên han jî-*
*Derheq hevtê erdê- esmîn, wan da zanînek tam dijî...*

*Eva deve- delûlê han- ji dewr û zemanên dijwar-*
*Têda çiqas nivşdang hene- hem nivîsar, hem jî bi zar?!*

*...Û şev- mişev ev bêxewî- wek karwanekî dewranbes,*
*Şingeşinga zenglê wî ye- feslên dewran me dike bes...*

*Û j'hêbeta ez radibim, ji bêxewiyê "hişyar dibim",*
*"Hişyar dibim" ji bêxewiyê û d'nav xwe da texmîn dikim...*

*Û, tê bêjî, ew karwana tamarên min ra dibeze,*
*Wê hêla serekê wî ye, d'guhê min da gazegaze:*

*-Binhêr, bira, tu j'bîr meke, çi ku îşev-mişev pêda*
*Min j'tera got û qise kir, sparte te ew karwana,*

*Hilde, bira, vî karwanî- berê sewdê wan pêşiyên me,*
*Bide pey kêşa pênûsê û tu cara dereng meke,*


*Wê hebûna kal- bavên me- durr- cewahran jê derîne,*
*Yek-yek weke rext û rişme kofiya Cîhana dê va ke!..*



*Binhêr, bira, binhêr, bira, ewî deve- delûlê me,*
*Wexta pêşda dibî, fesal, çiya- baniyan da winda nebe!..*

*-Min jî îro destkêş kirye devê karwanî pêşîkêş,*
*Û wê tînim, û wê tînim ewê xeznê j'we ra pêşkêş!..*

**Rêbendan, paşê- tîrmeh, 1985,**
**Sîpan-Yêrêvan**



# LEGLEGÊ HEZNÎ

**(Poêm)**

**"Qulingo, qulingê rubixurfî.."**
**(Ji strana gel a şînê)**

## PÊŞKULAM

*...Refê leglegan dîsa ji beriyê*
*Tîş daye, berbi aliyê me hatiye,*
*Û ewî refî mînanî berê*
*Hatiye- li nava gundê me daniye.*



*Cotê leglegan li ser dara me*
*Mînanî hersal hatye hêlûnê:*
*Yek "vedbijêre" der û dorên xwe,*
*Ê din j'şabûna bask dide l'dorê...*

*Û êvar- êvar ez tême malê,*
*Di bin dara tek-hewşê da rudinîm,*
*B'hemdê xwe demê didim cixaerê-*
*Sowbeta ewan leglegan dibihêm:*

*-Lê-lê, ca wê da, tu cî bide min,*
*Ez baş cî bibim d'kêleka te da,*
*Hem biponije, hem guh bide min-*
*Bibhê- min çi diye d'vê cîhanê da...*

*...Lê- lê xewgarê, qe tê bîra te,*
*Par paîzê bû, ez dereng hatim,*
*Tuye bi derdê xwe û xewa xwe,*
*Qe texmîn nekir- ça neheş ketim!?*

*Keça "Çîpeliyê", ca guh bide min,*
*Çi stu li te wisa maliq bûye,*
*Bibhê- min çi dît li çiyayê jorin,*
*Wê rojê li wir qe çi qewimiye?!..*

*Qe tu derc nakî- ew çi welat e-*
*Her top û tiving wir dikin qujîn:*

*Xelkî li bendî ra û tivdîra xwe,*
*Li wir şipûk û agir dibarîn.*

*Heya îro jî, ku tê bîra min,*
*(Ya Xweda, min diye, lê tu nebînî!)*
*Ricaf dikeve nava hestuyên min:*
*Ça-a dilerizim, keçê, dibînî?!-*

*...Û legleg li vir xwe civande hev,*
*Serî sparte serê hevalê,*
*Raman û bîra xwe irnd civand hev*
*Û bû sebebê vê galegalê.-*

## BAHARA PÊŞIN

### I

*... Wî gundî j'durva hêdî dû dikir-*
*Tev dişewitîn ter û hişk têda;*
*Mêr çûbûne çiyan, jin- zare- lmabûn wir:*
*Çek jî tunebûn wî gundê şên da...*

*Komên eskeran bi nar, avtomat,*
*Bi kuştin, wêran ketibûne gund-*
*Wek merivxuran û mîna celat*
*Wan xeza dikir wir gelekî xurt...*



*Gelê xurt dibêm,- îja çito gel?!*
*Heya zara jî mêrane şerkir,*
*Lê pirî zor bû dijminê çepel-*
*Leşker û... jin- zar... ewan ya xwe kir!*

*Tu tê nagihîjî, baş bû, te nedît-*
*Çawa beyankî zarok dikuştin,*
*Her ez bibînim, çi min li wir dît,*
*Ya Xweda j'bo çi wisa dikirin?!..*

*Paşê mêrên gund vegeryane gund,*
*Bi çek û bi hêz- b'gef û gur hatin,*
*Gundê wêran da bû şerekî kurt,*
*Eskerên nemerd gelek laş hiştin.*

*...Lê şerê neheq tu netemirî;*
*Roja din êdî ez wêda neçûm.*
*Û kuda jî çûm, dîsa şîn- girî,*
*Li her ciyan - wêran, şewat, telp û dû...*

### II

*...Min ji wir bask da, hilkişyame çiya-*
*Li her ciyan telp bû û bîna kizûr,*
*Gurîn- teqîn bû dîsa li her ciyan,*
*Û min hey bask da, ku hê herim dûr...*

*- Hê dûr?... Tuyê hê dûr kuda birevî:*
*Xwe nikaribûm ji xwe biçûma?*
*Û min jî bask da berb Çyayê Kûvî-*
*Xwest berbi cîkî seqir biçûma!..*

*Li vir jî qe çi çavên min dîtin?!*
*(Her te bidîta- çito mêranî!)*
*Mêra verê kir extiyar, zar û jin,*
*Li hember dijmin ew xurt sekinîn...*

*Her te bidîta, ka wana çi kir!-*
*Wexta kal û pîr, jin û zarok çûn,*
*Her yekî j'xwera wir tabîk çêkir*
*Û d'wan tabiyan da hîviya dijmin bûn!*

*Û, ji bo, merî ye, dema şere gur*
*Ewan tabiyên xwe nehêlin- neçin,*
*Her yekî nigê xwe qeyd- çîdar kir*
*Û miftên wan jî dan jina- şandin...*

*Keça "Qelpikê" îja tu zanî,*
*Tu tê digihîjî wan çima wa kir?!-*
*Ji bo, qewimî- l'wan bû tengasî,*
*Ew nikaribin bilivin ji wir!...*

*Û wan hetanî dema kutasiyê*



*Di tabiyên xwe da mêrane şer kir,*
*Çimkê zanibûn: l'wîalî tabiyê*
*Jin-zarên wan bûn,- û wan her tişt kir!..*

**III**

*...Wexta dijmin hat û gihîşte wir,*
*Li ser cinyazên wan ra sekinî,*
*Bi xwe ji çavên xwe bawer nekir,*
*Bû russas, ku dît... meytên qeydkirî!?*

*Êdî wî çaxî jin û zarên wan*
*Wîalî çyê va tam qulibî bûn:*
*Dijmin ji kirê ewan şêr- lehengan*
*Şil û şet bûyî- ker sekinîbûn...-*

*Li vira legleg bawîşkek rahişt,*
*Per li xwe dawşand, d'cî da rakişya,*
*Dît- jin razaye, serhatiya xwe hişt,*
*Xwe spart jinê, bi xwe jî raza...*

**IV**

*...Şeve ker bibû, melûl dinaliya,*
*Stêrk li esmîn şaş- metel mabûn,*
*Parçên serhatiyê bê ra dipekyan-*
*Di nav tariyê da zû winda dibûn.*

*Û werzebakî peyra dilîland,*

*D'keriya şevê da fesal digerya*
*Perçên serhatiyê yekhev dicivand,*
*Ji bo ku paşê bigihîne meriya...*

**V**

*...Û wisa herşev bahar- havînê,*
*Hetanî rojên paîzêye sar,*
*Di hewşa me da- çavî l'hêlûnê,*
*Ez rudiniştim- li wana guhdar.*

*...Û wextekê jî- kew- kewê sibê,*
*Qêrîna legleg min tesele bû,*
*Derketim derva- çi bibînim, wê*
*Refê wan êdî berî l'beriyê bû...*

*Werzebayê nas ji aliyê bakûr*
*B'hemdê xwe belgê dara diweşand,*
*(Refê leglegan êdî çûbû dûr!!!)*
*Bê perê legleg belçan ra dawşand...*

**BAHARA DUDA**

**I**

*...Û sal zivirî, zivistan j'me çû,*
*Çavkên baharê dîsa beçivîn,*
*Refên leglega ji beriya başûr*



*Li me vegeryan bi qûrîn- qîjîn.*

*Cotên leglegan çûn hêlûnên xwe,*
*Nuhhatiya j'xwe ra yên nuh çêkirin,*
*Lê ew hêlûna li ser dara me-*
*Leglegan qesta wêya nekirin.*

*Hêlûn ma vala- çav li riya xweya-*
*Tu leglegek jî berbi wê nehat...*
*Her dereng- dereng- çendekî şûnda*
*Dudu hatin wir, dorê perwaz dan...*

*Ewana melûl fitil dan dorê,*
*Bask wir dawşandin, kêlekê danîn,*
*Û min nas kirin cûcikên berê,*
*Ku l'vir mezin bûn û ji vir firîn.*

*Wana hêlûna hizhizî nuh kir,*
*Têda êwirîn mîna mala xwe,*
*Û min jî dîsa qelna xwe kar kir,*
*Çûm û rûniştim li ewî ciyê xwe.*

*Û dîsa, wexta tarî ket erdê,*
*Û, wexta stêrk l'esmîn berev bûn,*
*Mîna bûk- zavên çûbin pişt perdê,*
*Tariya şevê da ewan sepe bûn...*

**II**

*Tarîstanê da leglegê ciwan*
*Hevala xwec ra xweş sowbet dikir,*
*Bi çeqeçeqa nikulê çetel*
*Hevala xwe ra galegal dikir:*

*-...Par payîzê bû , em ji vir firîn,*
*Û çûn- gihîştin wargê xwe berê-*
*Rêncberan distira, kerî diçêrîn,*
*Wir xemilî bû her tişt l'çardorê.*

*Lê-lê, zerîyê, zerîya min nazdar,*
*Tê bîra te- wir çiqas bedew bû,*
*Mirovên wir jî bi van ra yekzar,*
*Bi cil- libas va mînanî van bûn...*

**II**

*...Û dîsa rokê j'jor agir barî-*
*L'her ciya dû-dûkêl û bîna kizûr...*
*(Hayanî kengê, gelo, ya Rebî,*
*Wê li wir wisa bibe qetilxûn?!..)*

*Û ew agira hat gihîşte me-*
*Gundê em têda tev şewitandin,*
*Em ji gund firîn, lê l'wir bavê me*
*Pêra negîhand- gulla ew jendin...*



**IV**

*...Şer ku seqirî, em paşda nahtin,*
*Lê diya me êdî ber xwe nedida,*
*Û me jî da dû, em pêra hatin-*
*Li ber çavan dît eva ecêba...*

*Li nav gundê me tuje cinyaz bûn,*
*Şaneşînê gund- teve şewitî,*
*Li dor cinyazan xwîn mewicî bû,*
*Tu cî nemabû bê meyt û kuştî...*

*Ji wê dîdemê min teyax nekir*
*Û got- Em herin ji vî ciyê bêxêr,-*
*Min hew dît- diya me mînanî kevir*
*Wê jorda pel bû û pekya berjêr.*

*Ew bi kevirkî jorda çû xarê,*
*Bû şelp1îna wê li rex kuştîkî,*
*Gola xwînê da bû şelpîna wê*
*Û li wir jî ma wisa feliqî.*

*Hinekî wêda- du-sê gav hebûn-*
*Me bavê xwe dît- li wira ketî-*
*Herdu baskên wî ji hev vebûbûn*
*Û nixamtibûn zareke kuştî...*

*-Leglegê ciwan axînek rahişt,*

*D'cî da raçivya, dor xwe nihêrî,*
*Carekê fesal baske xwe weşand,*
*Serî kir bin bask û hilnebirî...*

**PAŞKULAM**

*Min ewê şevê tevî ya kuştiya*
*Wisa jî bîriya wan leglega kir*
*Û serxweşî da wê koma zêndiya*
*Ya têkoşîna xwe dumahî kir.*

*Hema wê şevê werzebê bakûr*
*Perçên serhatiyê civand- gîhand min-*
*Nermik û nazik kire fûrefûr,*
*Perkê leglegê par hat bîra min.*

*Û ez rûniştim li ber textê xwe,*
*Anî, belgê vê destanê vekir,*
*Perkê leglegê kuştî da dest xwe*
*Û ev çend xetên hana pê rêz kir:*

*"Bila tu wexta li rû cîhanê*
*Xwîna tu kesî tucar nerije,*
*Bila tu legleg- li ser hêlûnê*
*Serhatîk wisa melûl nebêje!..."*

**Rêbendan- Reşemî, 1986**
**Sîpan- Yêrêvan**



# DOJEH

## I

*Dewr- zeman hatin, ji hev bihurîn,*
*Pêxember hatin- bi bînayên[19] xwe,*
*Meriv hatin- çûn, li hev êwirîn,*
*Her yek bihurî weke şanê xwe....*

*Hinekan hiştin bona mervahiyê*
*Bînayên xweye çêye merivhiz,*
*Lê hinekan jî hilda vê carê*
*Rêya qetilxwînê- merivxur û diz.*

*Hibekan gotin- yên mîna xwe ra*
*Mînanî bira divê tev bijîn,*
*Lê yekî jî got:"Çima, çi bira,*
*Çima pêwîst e- yên din jî bijîn?*

*Çiqas dikarî, tu wan bikuje,*
*Bikuje, ji bo herî cunnetê:*
*Kî çi dixaze, ha bila bêje,*
*Her kirê yên zor hesab dibin tê!"-*

*Û, wiha, eva çendik- çend dewr in,*
*Xwedêk dibêje- birê xwe nekuj!*
*Lê yekî dinê, êdî çend dewr in,*
*Dibêje- bikuj, bikuje, bikuj!...*

*-Bikuje, ji bo here bihuştê?-*
*Na, armanca wan ne tu bihuşt e...*
*Bi kirên wana gel in, wê hiltên,*
*Aqar zevt dibin- erdên min û te...*

*Û, wiha hatin, Xwedê hatin- çûn,*
*Yekî got- Bikuj!- Û yê dinê- Na!*
*Lê, yek e, mirov rêça xwe da çû...*
*(Û hê jî maye merivxur- ezna!)*

*Fesil bi fesil, bi alav hatin,*
*Bînayên Îsa, Mehmed û Hûda,*
*Ruh û sewdayê mirov hingavtin,*
*Ya Mehmed parek gelê min hilda...*

*Û para din jî j'nekarîya xwe*



*Wa vîalî- wîalî bi xwe j'xwe ta bû,*
*Xwest gelê xwe tam bigihîne xwe,*
*Dît, ku nikare, ji xwe cuda bû...*

*...Û eva yeka îro bûye mene,*
*Ji bo hinekên kirêt û nemerd*
*Du burên helal- xweşmêrên hêle,*
*Rakin dijî hev- bê text- tac û erd...*

*...Ey biborîne, tu- tifala min,*
*Ji evan derdan min tu j'bîr kirî,*
*Çiqas giran e îro kula min-*
*Gişk tevî hev bûye- bûye gêjgerîng...*

*Biborîn, ku min wêneyê te dît*
*(Ya Xweda, çiqas gunehkar im ez!?)*
*Û ne ku hatim bal te- wî berî,*
*Tu wisa hiştî bê îmdad û kes!..*

*Hûne çiqas bûn?- Deh, panzdeh, yan sed?*
*Na, çi dibêjim-bajarekî tam...*
*Ax... tu, Helebce- kula min bê hed,*
*Ji ewî derdî ez stuxar mam!*
*...Dibek ewana li ser vî erdî*
*Serê xweşmêran winda kiribûn,*
*Dema mêr li şêr ew bi nemerdî*
*Bi firokên xwe berb we firî bûn?*

*Minê bigota- Lê dêya te l'ku ma?-*
*Lê, va ye, ewe li rex te ketiye...*
*Çardorê kesî zêndî tune, na,*
*Agir- atafê wir her tişt sotiye...*

*Li vira heya zinar tîş bûne,*
*Tev şewitîne dar û kol vira,*
*Tîşên zinar jî wê peritîne,*
*Û ev hovîtî ji bo çi, çira?*

*Van dê û zarokan , kal û pîrên vir*
*Çi l'we kiribûn, revekên nemerd?-*
*Deşta şêr hiştî- hûn hatine vir,*
*Ser wan de reşand ew agir û derd!..*

*Lê keçika han?!... Eva han çavreş!*
*(Ser sîngê dê da çawa mêl bûye!)*
*Va, wê nişake wek qetranê reş*
*Cî- cîna ser wê û dê da reşyaye!*

*Xwîn e ew, yanê jehra hinartî,*
*Ku mirov çawa çek bi kar anîye,*
*Û ewê mîna kula hilatî*
*Bajarekî de jiyan vêsandiye...*

*...Lê ev dayka han- zar hemêzê da?!..*



*Çawa ser hev da bûne kerikong!-*
*Bi hestuyê yên wa vê cîhanê da*
*Welatêm dikin xîzgehke betreng.*

*Ya Xweda, nizam vêya ça navkim,*
*Ez navkim Doja Dantê[20], yan ya te?..*
*Û ta îro jî tê negihîştim-*
*Te zende l'wî xcist, yan ewî- li te?..*

*...Çi jî ku hebe- ya te, yan ya wî...*
*Lê her tiştekî ez esseh zanim-*
*Hûn ku wir bûna, hem te, hem jî wî,*
*Weê bigota- ev e, zor, canim!*

*Û tu û Dantê- wa zendegirtî,*
*Li wir bimînin, rind tercûberckin,*
*Ew bila lêke doja nuhdîtî...*
*Lê ruhên kuştiyan nifirya l'tekin.*

---

*Ax, tu- Helebce, ax, tu-Helebce,*
*Tuye birîna mine vebûyî,*
*Ax, tu- Helebce, ax, tu-Helebce,*
*Şehda nemerdiya mirove zêndî!..*

**III**

*...Û ta îro jî, wek wan pêşîyên xw,*

*Ew dijminê me dîsa maye ew,*
*Ger lê pêwîst be, me dighîne xwe,*
*Lê-k hema dem hat, me zol dike ew!..*

*Û em zol dibin mîna çermê gê,*
*Zol dibin, ne ku b'destê Çengzêrîn,*
*Lê mîna ewî çermê gaê çê,*
*Yê-k ketiye devê seyê devbixîn.*

*Û îro jî hê ewan dixwazin*
*Kurdistanê tam rastkin seranser:*
*Bi wan hestuyên me geliya tujekin,*
*Çya û banîyên me jorda bînin xar.*

*...A, b'vî teherî Dojeh Bihuştê*
*Welatê me da dike carîya xwe:*
*Kezîzerên me cîyê tuyî- netê*
*Tev xortên tûre diçin binaxe.*

---

*Ax, tu- Helebce, ax, tu-Helebce,*
*Tu kula mine xedar şaxdayî!..*
*Ax, tu- Helebce, ax, tu-Helebce,*
*Şehda nemerdiya mirove zêndî!..*

**Avrêl, 1989., Sîpan- Yêrêvan**

# FERHENGOK

1. ***Mûza- Xwedaya poêzîayê(helbestvaniyê), huner û zanistiyê- di mitolojiya yûnanî da.***

2. ***Parnas- Cîgeha jiyana Appolon û Mûza- di mîtolojiya yûnanî da. Di cîhana hunerî da wek sembola cîyekî bihurtî ji bo poêzîayê û hozaniyê tê dîtin.***

3. ***Ebba- Di nava ola katolîkî da papazê ber-pirsiyarê herêmeke rewanî(ruhanî). Herêm jî ebbayetî tê navkirin. Her weha hinek caran bi giştî papazan ra "ebba" dibêjin.***

4. ***Boşe- Mirtivên ermeniyan. Gund û bajaran digerin, kirîn- firotina pêdiviyên navmalê û koçekiyê dikin.***

5. ***Navçemk- Mêsopotamiya***

6. Hêllada- navê Yûnanistanê yê kevnar

7. Baykonûr- Fregeha Soviyetê ya kosmîkî li Kazakistanê

8. Sîpan - gundê kurdan li Ermenîsatanê, navê berê- Pampa kurdan

9. Pamp- li nasiya 8'an binihêre

10. Dibûrî, Şax, Kax, Kevrê Koro, Qulçik, Gêdûk, Mêrga Feyo- navên wargehên derdorên gundê Sîpanê(Pampê)

11. Karçaxpyûr- gundê ermeniya li ber gola Sêvanê

12. Pûnş- Vexwarineke rûsan e(spîrt û çaya tevî hev kirî), ya ku di sedsalên XVIII-XIX da arîstokrat û leşkerên payabilind dane bikaranîn.

13. Kxmêrên sor- endemên rêxistina siyasî leşkerî li Kambocayê.

14. Peywir- qulix, wezîfe



15. Maç- destika cot, an kotanê

16. Oazîs- Perçekî biçûk di nava xîzgehê (qûmistanê) da, li ku av û hêşnahî hene,bingehîn jî li ber bîran, li ser riyê bazirganiyê. Li van cîyan ji bo hêsabûna bazirgan û deveyan êwirgeh avakirine. Cîyên weha ra her weha "giravên jiyanê" dibêjin.

17. Navçemk- li nasiya 5'an binihêre.

18. Barxan- Girên ji xîzê çêbûyî- di xîzgehan da. Ji ber ku ev giran bi tu tiştî (dar û hêşnahî ) hev nagirin, dema ba û bahozan diherifin û yên nû çê dibin.

19. Bînayî- têorî, zanistî, ulm.

20. Dantê Alîgêrî- helbestvan- fîlosofê îtalî yê sedsalên XIII- XIV, xudanê poêmên "Bihuşt " û "Dojeh" (her yek ji wan dîwanek e.)

# NAVEROK

## PEŞGOTIN

Hevditineke derengmayi............5- 6

## BERGEHA PENÛSE

Ji Xwendevanen min ra..............8- 9
Kulama min..............................10- 11
Ez- nivşdang.............................12- 13
Ez u Mûza.................................14- 15

## BENGA WELÊT

Ji Kurdistanê ra........................18- 20
Xwezî......................................21- 22
Sond.........................................23- 24
Serhildan..................................25- 26
De rabe, ey kurd.......................27- 29

Xewn......................................30- 34
Temî.......................................35- 37
Awazên Pampê.......................38- 41

## HESÎN Û BÎRÎ

Kulama baharê..............................44
Beyta yê bengî..............................45
Beseke min hebû...........................46
Zerî..............................................47
Hesîn û bîrî....................................48
Bîrî...............................................49
Evînname.................................50- 51
Benga baharê..........................52- 53
Kurdam, li ku yî?....................54- 55
Gêjgerîng.................................56- 57

## PERGALA MIROV

Mirov î..........................................60
Şîretên diya min......................61- 62
Bê semivîsar............................63- 66
Poêt û rûdan...................................67



Poêtîka...........................................68
Kalkê min...............................69- 71
Ez ev im.................................72- 73
Drozga rojê.............................74-75
Û ezê wana çawa rizgarkim?..76- 79
Êlêgîa....................................80- 82
Ez û „ewan“............................83- 86
Elek- bêjing.............................87- 88
Rêportaj..................................89- 93

## ÇEREZÊN MITALA

Jiyanam xewn e..............................96
Pêlên jiyanê............................97- 99
Dibêjin..., Dibêjim.............100- 102
Beyt- binyat......................103- 109
Wexta bimirim..............................110
Xwemukurhatin.................111- 112
Hinkî- hinekî.....................113- 115
Nan...................................116- 117
Gulaş.............................................118

## BINDARÛKA BIÇÛKAN

Gul û dotka min................120- 121
Strana sêdeng....................122- 125

POÊM

Karwanên bêxewiyê...........127-133
Leglegê heznî.....................134-144
Dojeh..................................145-150

---

Ferhengok...........................151- 152

Заказ № 1376 Тираж 2000 экз.
Отпечатано в ТГТПС
Тамбов, Моршанское шоссе, 14

*KORDA MAD*

**KARWANÊN BÊXEWIYÊ**

**(Helbest û poêm)**

**Wêne: Nataşa Mînkova**